# MAFÊN ME HENE!

KOMELEYA MAFÊN MIROVAN ÊN JINAN-ÇARESERIYÊN NÛ

# MAFÊN ME HENE!

Çapa 1'em a Kurdî: 500 heb hatine çapkirin
Tîrmeh, 2014
Çapa 1'em a Tirkî, Stenbol, 2001

EDÎTOR
**Zana Farqînî - Zelal Bedriye Ayman - Metin Yüksel**

WERGERA Jİ TİRKÎ
**Zana Farqînî**

Wergera kitêbokê ya Kurdî ji aliyê **Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê** ve hatiye kirin.

KESÊN KU TEVKARIYA WAN LI ÇAPA KURDÎ YA 1'EM BÛYE
**Ayça Üzelgün Tekeli - Belkız Ayman - Derya Kaya**
**Metin Yüksel - Zana Farqînî - Zelal B. Ayman**
**Xebatkarên Komeleya Mafên Mirovan ên Jinan - Çareseriyên Nû**

KESÊN KU TEVKARIYA WAN LI ÇAPA A TIRKÎ BÛYE
**Ayşe Berktay Hacımirzaoğlu - Ayşegül Kaya-Ayten Özcan**
**Canan Arın - Ela Anıl - Evre Kaynak- Ferhan Özenen**
**Gülşah Seral - Irazca Geray- Leyla Gülçür - Vildan Yirmibeşoğlu**
**Liz Erçevik Amado - Pınar İlkkaracan - Ebru Batık - Deniz Kaynak**
**Fulya Ayata - Hülya Gülbahar - Karin Ronge – Lalezar Akar**
**Nigar Etizer Karacık - Saba Esin - Zelal B. Ayman**

XÊZ
**Duygu Serin**

BERHEMHÊNAN Û SEPAN
**Myra**

ÇAP
**İmak Ofset Basım Yayın San. ve Tic. Ltd. Şti.**
Atatürk Cad. Göl Sok. No: 1 Yenibosna
Bahçelievler/İSTANBUL-TÜRKİYE
Tel: 0212 656 49 97

Çapa 14'an a vê kitêbokê ya Tirkî, bi desteka Saziya Pêşveçûn û Hevkariyê ya Navneteweyî ya Swêdî (Swedish International Development Cooperation Agency - SIDA) ve hatiye kirin.

Wergera Kurdî a vê kitêbokê bi desteka darayî ya Konsolosiya Holandayê ya Stenbolê hatiye pêkanîn.

© Kadının İnsan Hakları Eğitim Programı (KİHEP), Haklarımız Var Kitapçık Serisi, "Haklarımız Var!" Kitapçığı

Komeleya Mafên Mirovan ên Jinan - Çareseriyên Nû / Kadının İnsan Hakları-Yeni Çözümler Derneği / Women for Women Rights (WWHR) - New Ways

ISBN 978-605-86324-5-5

Hollanda Kraliyeti

SWEDEN

ENSTÎTUYA KURDÎ STENBOL 1992

KOMELEYA MAFÊN MIROVAN ÊN JINAN-ÇARESERIYÊN NÛ

# NAVEROK


| | |
|---|---|
| PÊŞGOTIN | **4** |
| ÖNSÖZ | **5** |
| EGER EM JIN BI MAFÊN XWE YÊN QANÛNÎ BIZANIBIN DÊ ÇI FEYDEYA WÊ JI ME RE HEBE? | **6** |
| DI PEYMANÊN NAVNETEWEYÎ DE MAFÊN MIROVAN ÊN JINAN | **7** |
| DI CEDAW'Ê DE MAFÊN ME HENE! | **8** |
| PEYMANA STENBOLÊ | **11** |
| MAFÊN ME YÊN MAKEQANÛNÎ | **12** |
| MAFÊN MEDENÎ Û QANÛNA MEDENÎ YA TIRK | **14** |
| ZEWAC | **15** |
| LI DIJÎ ZEWACA BI ZORÊ EM DIKARIN ÇI BIKIN? | **15** |
| DER BARÊ HEVBERDANÊ DE MAFÊN ME YÊN QANÛNÎ ÇI NE? | **17** |
| REJÎMA MAL | **20** |
| TUNDIYA LI DIJÎ JINAN Û MAFÊN ME | **22** |
| QANÛNA JI BO HÊVIŞANDINA MALBATÊ Û RÊLIBERGIRTINA TUNDIYA LI DIJÎ JINAN | **24** |
| JINEKE KU TUNDÎ LÊ DIBE DIKARE ÇI BIKE? | **27** |
| DI REWŞA TAQÎBA ISRARDAR DE EM DIKARIN ÇI BIKIN? | **29** |
| MAFÊN ME YÊN ZAYENDÎ Û QANÛNA CEZA YA TIRK | **31** |
| NABE KU JIN BI TECAWIZKARÊ XWE RE BÊN ZEWICANDIN | **33** |
| TECAWIZA LI NAVZEWACÊ SÛC E | **35** |
| EGER EM LÊ WERQILIN KU ZAROKEK DUÇARÎ ÎSTISMARA ZAYENDÎ BÛYE EM Ê BIKARIBIN ÇI BIKIN? | **37** |
| ÎSTISMARA ZAYENDÎ YA ZAROKAN | **38** |
| TACÎZA ZAYENDÎ Û LI CIHÊ KAR TACÎZA ZAYENDÎ | **40** |
| "KUŞTINA JI BER NAMÛSÊ" | **42** |
| MAFÊ JINAN Ê KURTAJBÛNÊ HEYE | **44** |
| KONTROLA BEKARETÊ SÛC E | **45** |
| GILÎKIRINA SÛC | **46** |
| JI BO EZ MAFÊN XWE HÎN BIBIM EZ DIKARIM SERÎ LI KU DERÊ BIDIM? | **49** |
| FERHENGOK | **53** |

# PÊŞGOTIN

Komeleya Mafên Mirovan ên Jinan - Çareseriyên Nû, îsal kete sala xwe ya 20'î û ji sala 1995'an bi vir de jî bênavber di çarçoveya Bernameya Perwerdehiyê ya Mafên Mirovan a Jinan de meşa xwe didomîne. Em wek Komeleya Mafên Mirovan ên Jinan - Çareseriyên Nû gelek biheyecan û şad in ku me karî rêzeya kitêbokên **Mafên Me Hene! (Mafên Me Hene, Mafên Me Yên Zayekiyê Hene û Zayendîtiya Me Heye)** û belgefîlma **Rêzeya Mor** ku me ew di xebatên xwe yên tirkî de bi kar dianîn, wergerînin kurdî.

Komeleya me ku ji dema avakirina xwe heta niha girîngî dide xebata li Kurdistanê, bi taybetî girîngî da mafê zimanê dayikê ku ew mafekî sereke yê tênebihur ê mirovan e û di asta navneteweyî de jî hatiye pejirandin. Îcar gava ev maf ji aliyê jinan ve tên nirxandin girîngiya mijarê hîn bêhtir dertê holê. Encamên lêkolîna Weqfa Dîrokê (Tarih Vakfı) ku wê di navbera salên 1996 û 1998'an de çêkiribû, dida nîşandan ku li Tirkiyeyê %26'ê jinên kurd bi zimanê tirkî nizanin. Ji ber ku ji bilî vê, îstatîstîkên der barê vê mijarê de hema bibêje li Tirkiyeyê pir kêm in û yên heyî jî bi awayekî alîgir û şelipîner in, mirov bi hêsanî dikare texmîn bike ku ev rêjê hîn zêdetir e. Ev rewş dide nîşandan ku ji bilî mafê zimanê dayikê yê jinên kurd ên bi milyonan, hin mafên wan ên sereke jî hatine binpêkirin; bêyî cudahî mafê ku divê hemû jinên li dinyayê û Tirkiyeyê bi mafên xwe yên nivîskî û gotinkî bizanibin, mafê bikaranîna van mafan û mafê wek ferdên serbixwe û têra xwe da ku ew bikaribin di nav jiyanê de cih bigirin.

Ev pêvajoya wergera kurdî ya ku têra xwe gur û dijwar derbas bû, ji bo me ne tenê pêvajoyeke wergerê bû. Ev pêvajo her wiha pêvajoya hilberandina termînolojiya femînîst bû jî. Di beşa ferhengokê de, ku li dawiya her kitêbokê heye, hûn dikarin van term û têgihan bibînin. Der barê vê yekê de, ji edîtorên me Zana Farqînî bi zanîna xwe ya kûr û afirîneriya xwe tevkariyeke derasayî li me kir. Her wiha Metîn Yuksel jî, ji bilî tevkariya xwe ya edîtoriyê, di pêvajoya amadehiya weşanê de jî destekeke mezin da me. Belqîz Ayman, nemaze der barê termên zayekî û zayendîtiyê de ji bo me bû çavkaniyeke pir girîng. Bêyî alîkarî û tevkariya van kesên hanê ku me navên wan dan, em dê ji heqê vê yekê derneketina û bi ser neketina, ji lew re em ji wan hemûyan re spasiyên xwe yên bêpayan pêşkêş dikin. Her wisan ji hemû hevalên me re yên ku tirkiya kitêbokan amade kirine û ji xebatkarên me yê komeleyê re jî em dibêjin mala we ava.

Ji bilî vê, ji ber ku ji xebata me re desteka darayî dabîn kir ji *Konsolosiya Holandayê ya Stenbolê* re, ji *Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê* re ku wergera kurdî da kirin û ji *Saziya Hevgirtin û Pêşketinê ya Navneteweyî ya Swêdê* re ku bi salan e destek dide hilberandina kitêbokên tirkî, em ji ber alîkarî û tevkariya wan spasiyên xwe pêşkêşî wan dikin.

Gava mirov li atmosfera polîtîk û rûdanên ku di sala 2014'an de li Tirkiyeyê qewimîne difikire, bi awayekî pir aşkera dibîne ku mafê zimanê dayikê çi qas girîng e. Me jî wek rêxistineke jinan da ku em bikaribin alîkarî li bergiriya vê binpêkirina mafan bikin gavekî wiha avêt. Ev kitêbok û belgefîlm, niha di okyanûsê de wek dilopekê ye û ji bo zêdebûna van dilopan jî tevkariya her kesî pir hêja ye. Em hêvîdar in ku ev gava me avêtiye, dê piştgiriya me ya jinan a di warê rêlibergirtina îhlala mafan de, ku pir tê serê jinan, zêdetir bike.

*Zelal Ayman*
***Komeleya Mafên Mirovan ên Jinan - Çareseriyên Nû***
*Tîrmeh 2014, Stenbol*

# ÖNSÖZ

Bu sene 20. yılına girmiş olan Kadının İnsan Hakları-Yeni Çözümler Derneği olarak, 1995'ten bu yana kesintisiz olarak yürütmekte olduğumuz Kadının İnsan Hakları Eğitim Programı (KİHEP) kapsamında kullandığımız **Haklarımız Var!** kitapçık serisini **(Haklarımız Var, Cinselliğimiz Var, Doğurganlık Haklarımız Var)** ve **Mor Dizi** belgeselini Kürtçe'ye çevirmiş olmaktan büyük heyecan ve mutluluk duyuyoruz.

Kuruluşundan bu yana Kürdistan'da çalışmaya önem veren Derneğimiz, uluslararası düzeyde kabul görmüş temel ve vazgeçilmez bir insan hakkı olan anadil hakkına özellikle önem verdi. Zira bu hak kadınlar açısından değerlendirildiğinde çok daha önem kazanıyor. Tarih Vakfı'nın 1996-1998 yılları arasında yaptığı araştırma sonuçları, Türkiye'deki Kürt kadınlarının % 26'sının Türkçe bilmediklerini gösteriyordu. Bu veriler dışında, Türkiye'de bu konuyla ilgili istatistiklerin yok denecek kadar az ve aynı zamanda taraflı ve yanıltıcı olduğu göz önünde bulundurulduğunda, bu oranın daha yüksek olduğu rahatlıkla varsayılabilir. Bu durum, milyonlarca Kürt kadınının anadil hakkı dışında bazı diğer temel haklarının da ihlal edildiğini gösteriyor: ayrım gözetmeksizin dünyada ve Türkiye'deki tüm kadınların yazılı ve sözlü haklarını bilme hakkı, bu haklarını kullanma hakkı ve bağımsız, kendine yeten bireyler olarak hayatın içinde yer alma hakkı.

Oldukça yoğun geçen Kürtçe çeviri süreci bizler için sadece bir çeviri süreci olmadı. Bu süreç aynı zamanda, feminist terminolojiyi Kürtçe üretme süreciydi de. Bu terimleri her kitapçığın sonundaki Ferhengok (Sözlükçe) bölümünde bulabilirsiniz. Bu konuda editörlerimizden Zana Farqînî'nin derin bilgisi ve yaratıcılığı olağanüstü bir katkıda bulundu. Aynı şekilde Metin Yüksel, editörlük konusundaki değerli katkılarının yanısıra yayın hazırlığı sürecinde bizlere çok büyük destek verdi. Belkız Ayman, özellikle doğurganlık ve cinsellik ile ilgili terimler konusunda başvurduğumuz çok önemli bir kaynak kişi oldu. Saydığımız kişilerin katkısı olmadan bu işi başaramazdık, kendilerine sonsuz teşekkür ediyoruz. Ayrıca kitapçıkların Türkçe'sini hazırlayan bütün arkadaşlarımıza ve dernek çalışanlarımıza da katkıları için çok teşekkür ediyoruz.

Bunun dışında bu çalışmamıza kaynak sağlayan *İstanbul Hollanda Konsolosluğu*'na, Kürtçe çeviriyi yaptıran *İstanbul Kürt Enstitüsü*'ne ve Türkçe kitapçıkların üretimini yıllardır destekleyen *İsveç Uluslararası İşbirliği ve Kalkınma Örgütü*'ne değerli katkıları için teşekkür etmek istiyoruz.

2014 yılında Türkiye'de yaşanan politik atmosfer ve gelişmeler düşünüldüğünde, anadil hakkının ne kadar önemli olduğu çok açık. Biz bir kadın örgütü olarak bu hak ihlalinin önüne geçmeye katkıda bulunmak adına bu adımı atmış durumdayız. Bu kitapçıklar ve belgesel, şimdilik okyanusta bir damla ve bu damlanın büyümesi için herkesin katkısı çok kıymetli. Umarız attığımız bu adım kadınların yaşadığı yoğun hak ihlallerini önleme yolundaki kadın dayanışmamızı daha da artırır.

*Zelal Ayman*
***Kadının İnsan Hakları-Yeni Çözümler Derneği***
*Temmuz 2014, İstanbul*

# EGER EM JIN BI MAFÊN XWE YÊN QANÛNÎ BIZANIBIN DÊ ÇI FEYDEYA WÊ JI ME RE HEBE?

Zanebûn, me xurt dike. Loma zanebûna me ya bi mafên me yên qanûnî jî pir girîng e. Îcar hiqûq, der barê gelek tiştan de yên ku di jiyanê de derdikevin pêşiya me, sererastkirinan pêk tîne. Gava mafên me tên binpêkirin, em bêçare namînin û beriya ku binpêkirin pêk werin jî, mirov dikare rê li ber wan bigire.

Mesela rengê nasnameya me, kincên ku em ê li kuçeyan li xwe bikin, em ê çawan bizewicin, eger em dev ji zewacê berdin gelo dê çi bi diyariyên nîşanê bên, mafên me yên di nav zewacê de ew ê çi bin, eger şidet li me bê kirin em ê bikaribin çi bikin, ku em hev berdin wê mal û milk çawan bên parîkirin, em ê bi çi awayî bibin endama komeleyekê, eger li cihê kar tacîz li me bibe em ê bikaribin çi bikin û her wekî din, ji van pêkanînan in.

Digel ku zanîna bi qanûnan ew qas girîng e jî, lê belê ji ber ku gelek kes tevî perwerdehiya hiqûqê nebûne ji zimanê hiqûqê fehm nakin û li wan pir zor tê. Qanûn bi peyvên wisan tije ne ku di zimanê rojane de nayên bikaranîn û her wisan hevok jî dirêj û dijwar in. Ji ber vê rewşê, yên ku herî zêde tesîr li wan dibin jî jin in. Li gorî mêran, jin bêhtir zehmetiyê dikişînin gava dixwazin xwe bigihînin van çavkaniyên hanê yên ku dikarin mafên xwe ji wan hîn bibin. Îcar gava em mafên xwe bizanibin em ê xurttir bibin û ev yek jî dê wisan bike ku jiyana me biguhere. Lê eger em bizanibin, em dikarin mafên xwe bixwazin û li wan jî bibin xwedî. Dema jinek bi mafên xwe yên qanûnî bizanibe, dê ev yek rê li berê hêsantir bike da ku bikaribe der heqê jiyana xwe de bibe xwedî gotin. Ji bo nimûne, ew jina ku şidet lê bê kirin, eger bi mafên xwe bizanibe, xwe bêparastin û bêçare nabîne. Ji ber ku dizane ew şideta lê tê kirin, sûc e. Gava jin bizanibe dikare bi awayê qanûnî çi bike da ku xwe ji şidetê bihêvişîne û dawî li şidet bîne, wê bike ku ew kesê şiddetê lê dike were cezakirin û bi vî awayî jî dê xwe xurt û hêzdar bibîne. Dema ku pê bizanibe dikare çi bike, bêdeng namîne, serî li rayedaran dide û ji wan dixwaze ku hin tedbîran hildin. Ew jina ku dizane li gorî Qanûna Medenî di nav malbatê de jin û mêr wekhev in, wexta mêr bixwaze keça xwe neşîne dibistanê û di emirekî biçûk de wê bizewicîne, dikare îtiraz li hevserê xwe bike, eger hevserê wê neyê rê, îcar dikare bi riyên qanûnî li mafên keça xwe bigere. Yan jî ew jina dizane ku li gorî qanûnan wexta ew bixwaze bixebite ne mecbûr e ji hevserê xwe destûrê bistîne û gava hevserê wê jê re bibe asteng jî ew dikare li mafên xwe bigere yan jî serî li mehkemeyê bide.

Di vê kitêbokê de, ku me wek Komeleya Mafên Mirovan ên Jinan - Çareseriyên Nû ew amade kiriye, me tenzîmên hiqûqî yên li ser mafên mirovan ên jinan ji xwe re kirine mijar. Mafên jinan hem bi peymanên navneteweyî hem jî bi qanûnên neteweyî tên parastin. Em ê serê pêşîn ji mafên xwe yên ku di metnên hiqûqî yên navneteweyî de cih digirin behs bikin ku Tirkiye mecbûr e wan bi cih bîne. Piştre jî em ê behsa mafên xwe bikin ku ew di qanûnên neteweyî de cih girtine, yên wekî Makeqanûn, Qanûna Medenî, Qanûna Ceza, Qanûna Ji Bo Hêvişandina Malbatê û Rêlibergirtina Şideta Li Dijî Jinan. Di kitêbokê de me hewl da ku em mafên xwe û riyên bidestxistina van bi nimûneyên ji jiyana rojane û bi zimanekî sade û hêsan pêşkêş bikin. Em hêvîdar in ku dê ev kitêboka bi navê **Mafên Me Hene!** li ser wan tiştên ku jin wan meraq dikin, agahiyan bide wan, alîkarî li xurtbûna wan bike û bi kêrî wan were ku gava ew bixwazin, bikaribin berê jiyana xwe li gorî dilê xwe biguherînin.

# DI PEYMANÊN NAVNETEWEYÎ DE MAFÊN MIROVAN ÊN JINAN

Em gişt bêyî cudahiya nîjad, reng, zayend, ziman, dîn, nêrîna siyasî yan tiştekî din, koka neteweyî yan jî civakî, serwet û welidînê bi awayekî azad û ji aliyê mafan ve jî wekî hev, ji dayik dibin. Têgiha maf, bêyî ku mirov têkilî awayê jiyana kesên din bibe, azadiya me ya ku em ê bi xwe şekilê jiyana xwe diyar bikin, nîşan dide. Li hemberî dewletê her yek ji me bêyî ku duçarî cudakariyê bibe, xwedî mafên wekî jiyan, azadî û wekhevî, milkiyet û garantiyê ye. Ev maf ji dayikbûna me dest pê dikin û di tevahiya jiyana me de jî bêqutbûn dewam dikin. Ew, bi qaydeyên ku riayetkirina wan mecbûrî ye û em ji wan re dibêjin hiqûq, yanê bi qanûnan dikevin bin temînatê.

Hiqûq tenê bi qanûnên neteweyî yanê bi qanûnên aîdî wî welatî pêk nayê. Peymanên navneteweyî jî mafên mirovan diparêzin. Dewleteke ku peymaneke navneteweyî îmze û pesend kiribe, wê garantiyê dide ku dê madeyên peymanê binpê neke û wan bi cih bîne. Bi vê yekê hem garantiyê dide dewletên din ên ku wan peyman îmze û pesend kiriye, hem jî dide welatiyên xwe. Peymanên navneteweyî di ser qanûnên neteweyî re ne û welatên ku peyman îmze kirine, mecbûr in qanûnên xwe li van peymanan bînin. Wek mînak, Peymana Mafên Mirovan a Ewrûpayê, belgeyeke wiha ya hiqûqî ya navneteweyî ye. Tirkiye gelek peymanên navneteweyî yên ku mafên mirovan ên jinan û wekheviya zayendê dixe bin garantiye, îmze kirine û bi vî awayî jî berpirsiya ku dê wan di pratîkê de bi cih bîne, qebûl kiriye.



## Peymana Rêlibergirtina Her Cure Cudakariyên Li Dijî Jinan (CEDAW)


Neteweyên Yekbûyî, bi armanca ku rê li ber şidet û cudakariya ku ji ber jinbûnê li jinan dibe bigire, di sala 1981'ê de **Peymana Rêlibergirtina Her Cure Cudakariyên Li Dijî Jinan (CEDAW)** xist meriyetê. Vê peymanê gelek mafên jinan ên  wekî zewac, hevberdan, jiyana gelemperî û yên der barê bedena wan de mihefeza dike. Wan dewletên ku ev peyman îmze kir, her wisan wan qebûl kir ku ji bo jin jî wekî mêran ji mafên mirovan bi awayekî wekhev feyde bibînin, dê sererastkirinên pêwîst di qanûnên xwe de çêkin. Tirkiyeyê jî di sala 1985'an de ev peyman îmze û pesend kir. Yanê hikûmeta Tirkiyeyê berpirsî hilda ser xwe ku ew ê qanûnên xwe yên neteweyî li gorî peymanê biguherîne.

Di hin waran de dibe ku qanûnên neteweyî û peymanên navneteweyî li hev nekin. **Li gorî xala 90'î ya Makeqanûnê**, li ser rewşên der barê maf û azadiyên sereke de, eger nelihevkirinek hebe, madeyên peymanên navneteweyî derbasdar in. Mesela, xala 187'an a Qanûna Medenî dibêje ku ew jinên dizewicin divê paşnavê hevserên xwe hildin, paşnavên xwe jî tenê dikarin digel paşnavê mêrên xwe bi kar bînin. Lê belê peymanên navneteweyî yên mîna CEDAW û Peymana Mafên Mirovan a Ewrûpayê diyar dikin ku eger jin bixwazin dikarin tenê paşnavê xwe yê beriya zewacê jî bi kar bînin. Ew jin a ku ji ber vê nelihevkirinê serî li dadgehê dabe, tenê mafê bikaranîna paşnavê xwe yê beriya zewacê bi dest dixe.

# DI CEDAW'Ê DE MAFÊN ME HENE!

## Qanûn, Polîtîka û Pêşdarazî

- Di çarçoveya wekheviya jin û mêran de, **bêyî ku li rewşa wan a medenî bê nêrîn**, feydedîtina ji mafên mirovan û azadiyên bingehîn a **hemû jinan** tê temînkirin.
- Hemû dewletên teref divê qanûnên heyî yên cudakar biguhêrin, hilînin an jî bi qanûn û polîtîkayên ku dê pêk bînin, hewce ye li dijî cudakariya li ser jinan tê bikoşin û bi awayekî rast wekheviya jin û mêran pêk bînin.
- Hemû dewletên teref mukelef in hewl bidin da ku di warên polîtîk, civakî, aborî û çandî de **jin tam bigihên** û bi pêş bikevin.
- Bi tedbîrên taybet û demkî yên ku dê bên standin, pêkanîna wekheviya jin û mêran dikare bê lezandin. Wek nimûne, li warên ku em li wan kêm hatine temsîlkirin (mîna Meclîsê), heta ku bi rastî nûneriya wekhev pêk were, dibe ku bicihanîna kotayê ya ji bo jinan were bikaranîn.
- Divê dewletên teref ji bo ku bi fikirên kêmbûn an jî serdestiya jin û mêran re û bi rolên qalibgirtî re yên ku xwe dispêrin pêşdarazî, urf û adetan, tê bikoşin û tedbîran hildin. Mesela der barê karên navmalê û xweyîkirina zarokan de, bi qasî jinan mêr jî berpirs in. Ev kar divê bi **adilane** bên parvekirin.



## Bazirganiya jinan û îstismara karkeriya seksê

- Dewlet mukelef in ku divê bergirî li **bazirganiya jinan û li îstismara karkeriya seksê** bikin.

## Siyaset û qada gelemperî

- **Mafên jinan** heye ku hilbijêrin û bên hilbijartin, beşdarî polîtîkayên hikûmetê bibin, di partiyên siyasî de, di wezîfeyên gelemperî û di saziyên civakî de **wezîfeya aktîf** hildin.

- Mafên jinan heye ku di qadên navneteweyî de welatên xwe bi mêran re **bi awayekî** wekhev temsîl bikin û di saziyên navneteweyî de peywiran hildin.

## Netewetî

- Jin hem ji bo xwe hem jî ji bo zarokên xwe di warê bidestxistina netewetiyê, guhartin û mihafezekirina wê de, bi mêran re xwedî eynî mafan in. Ev maf, wexta ku jin hevserên xwe hildibijêrin, naguhere.

## Perwerde

- Temîna wê yekê tê kirin ku divê jin û mêr ji pêşdibistanê heta bi xwendina bilind **di warê perwerdehiyê de xwedî derfetên wekhev** bin. Nemaze ji bo kêmkirina cudahiyên zayendê yên heyî, tiştekî girîng e ku jin jî wekî mêran xwe bigihînin eynî burs û bernameyên hîbeyan. Hikûmet mukelef in ku di perwerdehiyê de rolên jin û mêran ên qalibgirtî ji holê rakin.

## Jiyana kar û xebatê

- Divê mafê xebatê yê jinan ji aliyê hikûmetan ve bên parastin. Temîna wê yekê tê kirin ku jin jî wekî mêran xwe bigihînin perwerdehiya wekhev û derfeta kar. **Ji bo karê wekhev mizeya wekhev tê dayîn**. Li cihê kar, ji ber rewşa der barê zayendê de yên mîna rewşa zewacê, ducanîtî û dayiktiyê, cudakarî nayê kirin. Divê cihên kar, destûra dayiktiyê ya mizedar pêk bînin û xizmetên civakî teşwîq bikin da ku dê û bav bikaribin berpirsiyên xwe yên malbatî digel jiyana xwe ya kar jî bidomînin.

## Tenduristî

- Welat mukelef in ku hemû tedbîran hildin da ku di warê xizmetên tenduristiyê de li jinan cudakarî neyê kirin. Di serî de, **lênêrîna bêmize ya jinan a ji bo beriya zarokanînê û piştî wê**, divê xwegihandina xizmetên bijûndariyê ya bi awayê wekhev, bê dabînkirin.

## Jiyana aborî, civakî û çandî

- Temîna wê yekê tê kirin ku jin **bi awayekî wekhev xwe bigihînin alîkariyên malbatî û krediyan**. Ew bi mêran re bi awayê wekhev tevî çalakiyên civakî û çandî dibin.

## Jinên ku li deverên gundewar dijîn

- Ji bo ku jinên li deverên gundewar dijîn bikaribin xwe bigihînin xizmetên civakî, perwerde û derfetên kar, **lazimatiyên wan ên taybet** li ber çav tên girtin û wisan tedbîr tên hildan.

## Wekheviya li pêşberî qanûnan

- Dozên wekî zewac, hevberdan, welayet, peyman, xwedîtiya mal jî tê de, der barê hemû mijarên hiqûqî de, **jin û mêr li ber qanûnan wekhev in.**

## Têkiliyên malbatî

- **Jin û mêr di zewacê de xwedî eynî mafan in**. Jin bi xwe biryar didin ka dê bizewicin an nezewicin û eger bizewicin jî dixwazin bi kê re bizewicin. Di wexta berdewamiya zewacê de û piştî hevberdanê, ew xwedî eynî maf û berpirsiyan in. Ew mafên şexsî yên li ser mijarên wekî dê jin çend zarokan bîne û kengê zarokan çêke, dê bi çi awayî wan mezin bike û bigihîne, paşnav, hilbijartina meslek û kar, bi ewladî xwedîkirina zarokan û mafê milkiyetê gişt di bin parastinê de ne.

### Serlêdana Komîteya Rêlibergirtina Her Cure Cudakariyên Li Dijî Jinan (Komîteya CEDAW'ê)

Me di sala 2000'î de mafê serlêdana şexsî ya li Komîteya CEDAW'ê bi dest xist. Eger li Tirkiyeyê dozên ku me vekirine bêencam bimînin, bi awayekî nemaqûl dirêj bibin an jî bi neyînî bi encam bibin, em dikarin li qadên navneteweyî li mafên xwe bigerin, wekî serlêdana Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê. Eger hûn bixwazin serlêdaneke wiha bikin, dê îhtiyaca we bi parêzerekê/î hebe.

# PEYMANA STENBOLÊ

Li Tirkiyeyê peymana navneteweyî ya pêşîn di Gulana 2011'an de hate îmzekirin ku ew der barê şideta li dijî jinan a navmalê de xwedî hêza mueyîdeyê ye. Ji ber ku li Stenbolê hatiye îmzekirin jî, bi kurtî jê re **Peymana Stenbolê** tê gotin û navê wê yê tam jî *Peymana Konseya Ewrûpayê ya Ji Bo Berlêgirtina Şideta Li Dijî Jinan, Şideta Li Navmalê û Têkoşîna Bi Wan Re ye*. Vê peymanê mukelefbûn daye ser welatên ku wan ev peyman îmze û pesend kiriye da ku der barê cureyên şideta fizîkî, zayendî, aborî û hîsî de tedbîrên qanûnî hildin. Peyman di Çiriya Paşîn a 2011'an de li Meclîsa Neteweyî ya Mezin a Tirkiyeyê hat qebûlkirin, lê belê ji ber pêşmercên ku peyman pê bikaribe bikeve meriyetê bi cih nehatin anîn, peyman hîn ne derbasdar e.

Di Peymana Stenbolê de, ji bo kesên ku duçarî şidetê bûne yan jî talûkeya duçarbûna wan heye, nemaze der barê jin û zarokan de, madeyên hêvişîner û bergir hene:

## Bi vê peymanê:

- Ji bo amadekirina **stargehên** xwedî hewandina ewledar û yên ku mirov bikaribin bi rihetî xwe bigihîne wan, dê tedbîrên hewcedar bikaribin bêne standin,
- Ji bo kesên ku duçarî şidetê bûne, dê li tevahiya welêt **xetên destekê yên telefonan** bên avakirin da ku 24 saet bi awayekî bênavber û bêmize xizmeta şêwirmendiyê bidin,
- Ji bo kesên duçarî şidetê bûne, dê **navendên arastekirinê** yên tecawiz, qeyran an jî şideta zayendî bên damezirandin, da ku ji wan re desteka mieyeneya tibî û edlî, travma û şêwirmendiyê dabîn bike,
- Ji bo kesên ku bûne şahidê pêkhatina kiryariyên tundiyê, da ku li nik meqamên rayedar îxbara vê yekê bikin, dê bên teşwîqkirin. Ji mexdûrên şidetê re dê hin **riyên serlêdanê yên hiqûqî** bên dabînkirin,
- Ji bo kesên ku duçarî şidetê bûne, dê hewl bê dayîn ku **tezmînatê** bidin wan,
- Ji bo ku rê li ber kiryariyên tundiyê yên kesên ku şidetê pêk tînin, were girtin û şidet were astengkirin, dê **bernameyên ku perwerdekirinê ji xwe re dikin armanc**, werin hazirkirin.

Her wiha dê dewletên teref; çand, urf û adet, dîn, kevneşopî yan jî xwedêgiravî namûsê wek sedema kiryariyên şidetê qebûl neke. Li dijî hemû şekilên şidetê, dê hêzên ewlekariyê yên berpirs di zûtirîn demê de parêzkar bidin kesên ku duçarî şidetê bûne. Sûcên şidetê dê bi gilîkirina mexdûr û îfadeya wan ve ne girêdayî be. Eger dev ji gilî bê berdan jî, dê lêpirsîn bidome. Zorlêkirina li kesê gêran an jî li zarokan a ji bo zewicandinê, dê sûc be. Bêyî barê zêde yê malî û îdarî, fesxkirin, betalkirin û bidawîkirina zewacên ku bi zorê hatine kirin, dê bên pêkanîn.

# MAFÊN ME YÊN MAKEQANÛNÎ

Makeqanûn tevahiya qaydeyan e ku ew awayê xebatê yên saziyên sereke yên dewletê û maf û azadiyên sereke yên welatiyan ên li hemberî dewletê, sererast dike. Li gorî Makeqanûnê li ber qanûnan, wekheviya jin û mêran di bin temînatê de ye. Lê di jiyanê de pêkanîna vê wekheviyê her tim ne hêsan e. Ji ber vê yekê têgihên **cudahiya êrênî yan jî tedbîrên taybet ên demkî** hatine rojevê. Cudahiya erênî, bi awayekî qebûlkirina wê yekê ye ku heta roja îro li jinan neheqî hatiye kirin. Ji vî aliyî ve jî pir girîng e. Ew yek tê wateya desteka telafîkirina neheqiyên ku heta niha li me bûne û teşwîqkirina sepanan da ku em jin bi rastî bikaribin bibin xwediyê maf û wekheviya firsendê û di nav civakê de jî bi mêran re bibin xwedî eynî rewşê. Wek nimûne, ji bo ku jin hîn zêde li zanîngehan an jî li mekanîzmayên standina qeraran, wekî Meclîsê, cih bigirin, divê biryar li ser rêjeyeke diyar a hilbijartina jinan were dayîn û ev yek jî bê sepandin: a ev ji cudakariya erênî re mînakek e. Ji vê pêkanînê re **kota** tê gotin. Her wiha eger di wexta hildana kar de pêşîtî û berêtiyê bidin jinan, ji bo kargehên ku bi rêjeyeke diyar rêveberên jin didin xebitandin, pêkanîna hin alîkariyên bazirganî dîsan mînakên cudakariya erênî ne. Mebesta giştî ya van sepanan jî zêdekirina hêza jinan a temsîlê ye.




Prensîba pêkanîna wekheviya jin û mêran, berê di Makeqanûnê de tune bû. Ji bo ku ev prensîb bikeve Makeqanûnê, li Tirkiyeyê rêxistinên jinan têkoşîneke zêdetirî deh salan da meşandin. Di sala 2004'an de, di guhartinên berfireh ên Makeqanûnê de, ji bo ku di pratîkê de yeksaniya jin û mêran pêk were, cudakariya erênî/ sererastkirinek der barê tedbîrên taybet ên demkî de hate kirin. Li xala 10'an a Makeqanûnê ev gotin hatin zêdekirin: **"Jin û mêr xwedî mafên wekhev in. Dewlet bi temînkirina pêkanîna vê wekheviyê mukelef e. Tedbîrên ku ji bo vê armancê bên hildan jî, li dijî prensîba wekheviyê nayên şîrovekirin."**

## Li gorî Makeqanûnê:

- Her kes xwedî mafê jiyînê, hêvişandina hebûna xwe ya madî û manewî û bipêşxistina wan e.
- Tu kes bi zorê nayê xebitandin. Karê suxreyê qedexe ye.
- Her kes, xwedî azadiya şexsî û ewledariyê ye.
- Mafê her kesî heye ku bixwaze li jiyana wê/wî ya taybet û li jiyana wê/wî ya malbatî rêz bê girtin. Destnedana rûniştgehê heye. Her kes xwedî mafê azadiya ragihandin, cihwarbûn û gerê ye.
- Her kes xwedî wê azadiyê ye ku dikare bi serbestî wicdan, baweriya dînî, qenaet, raman, îfade, zanist û hunerê hîn bibe.
- Her kes azad e ku bêyî berê destûr bistîne komele ava bike, bibe endamê wan an jî ji endamtiyê derkeve û meşa xwepêşandanê ya bêçek û êrîş, li dar bixe.
- Her kes xwedî mafê milkiyet û mîrasê ye.
- Her kes xwedî mafê darizandina adil e.
- Malbat, hîmê civaka tirk e **û xwe dispêre wekheviya li navbera hevseran**. Dewlet li dijî her cure îstismar û şidetê, tedbîrên hêvişîner hildide.
- Tu kes ji mafê xwendin û perwerdehiyê bêpar nayê hiştin.
- Her kes xwedî wê azadiyê ye ku bixwaze li ku derê bixebite û peymanan çêke. Nabe ku tu kes li karên ku ne li gorî temen, zayend û hêza wê/wî be, were xebitandin.
- Ji bo ku xebatkar û kardar, maf û berjewendiyên xwe yên aborî û civakî biparêzin û bi pêş bixin, mafê wan heye ku bêyî berê destûr bistînin sendîka ava bikin.
- Mafê her kesî heye ku li jîngeheke bijûndar û biserûber bijî.
- Li gorî mercên ku di qanûnan de hatine nîşandan, mafê welatiyan heye ku hilbijêre, bê hilbijartin û bi awayekî serbixwe yan jî di nav partiyeke siyasî de çalakiyan bike û beşdarî referandûmê bibe.
- Mafê welatiyan heye ku partiyên siyasî ava bike, li gorî usûlê beşdarî partiyan bibe û ji partiyan veqete.

Her kes, ji bo maf û azadiyên xwe yên sereke yên ku di Makeqanûnê de di bin temînatê de ne û ji bo yên ku di nav Peymana Mafên Mirovan a Ewrûpayê de cih digirin, eger ku yek ji wan jî ji aliyê hêza gelemperî ve bê binpêkirin, bi vê îdiayê dikare serî li Dadgeha Makeqanûnê bide. Ji bo serlêdanê şert ew e ku divê riyên qanûnî yên asayî bên temamkirin.

# MAFÊN MEDENÎ Û QANÛNA MEDENÎ YA TIRK

Mafên medenî, ew maf in ku li Tirkiyeyê jin û mêr, hemû welatî xwediyê wan in. Mafên wekî dergistîbûn, zewicîn û bûna xwediyê mal, ji mafên me yên medenî ne. Hiqûqa medenî, şaxeke hiqûqê ye ku mafên medenî yên mirovan, yanê têkiliyên wan ên malbatî, mîras, eşya û deynan sererast dike.

Qanûna Medenî ya Tirk a pêşîn, ku ew di sala 1926'an de hatiye qebûlkirin, bi mexseda hem xwe bigihîne rewşa îro hem jî ji bo ku madeyên xwedî naveroka cudakariya li dijî jinan in jê derxe, di encama hewldana berdewam a 50 salî de, di sala 2002'yan de bi temamî hate guhartin.



Xebatên zêde yên tevgera jinan, kir ku guhartinên cidî di beşa "Hiqûqa Malbatê" de pêk werin ku ev jinan pir eleqedar dike. Qanûna Medenî ya nû, ku ew der barê malbatê û rola jinan a di nav malbatê de xwedî nêrîneke nû ye, êdî malbatê wek şirîkatiyeke ku xwe dispêre wekheviya jin û mêran terîf dike. Bi saya vê ferasetê, ku ew eksî zimanê qanûnê jî bûye, têgihên "jin" û " mêr" cihên xwe daye gotina "hevser." Her wiha zimanê qanûnê jî têra xwe hatiye sadekirin ku êdî her kes bi rihetî dikare jê fehm bike.

Niha jî em li hin mafên xwe yên ku di Qanûna Medenî de cih girtine binêrin û bizanin bê em ê di kîjan rewşan de û bi çi awayî bikaribin wan bisepînin ango tetbîq bikin.

# ZEWAC

- Mafê biryardayînê yê me jinan e da ku em ê bizewicin an nezewicin, an jî em ê bi kê re bizewicin.
- Jin dibe mêr dibe, heta 17 saliya xwe neqedîne nikare bizewice. Ji bo zewaca kesên ku ji 17 salî biçûktir in, şertên diyar hene. Divê wan temenê xwe yê 16'an temam kiribe, bi rizaya wan û ya dê û bavên wan be û divê ku dadger jî destûrê bide.
- Nîkeha dînî piştî ya fermî dikare bê çêkirin (Qanûna Medenî, xal 143). Tenê birîna nîkeha dînî yan jî beriya ya fermî, birîna wê sûc e. Kesên ku beriya dîtina belgeya fermî ya nîkehê, mehra dînî bibire, tên cezakirin (Qanûna Ceza, xal 230 [5-6]).
- Li pêşberî qanûnan tu cih û rewabûna qelen nîn e. Jin dikarin her tim li dijî vê yekê rabin. Jinek dikare bide xuyakirin ku ji ber qelen bêyî dilê xwe hatiye zewicandin û betalkirina zewaca xwe bixwaze.

# LI DIJÎ ZEWACA BI ZORÊ EM DIKARIN ÇI BIKIN?



Eyşe jineke ciwan a 17 salî ye, bavê wê karker û diya wê jî bermalî ye. Rojekê bavê wê dibêjê ku dê êvarê xwezgîniyê wê bên. Ji Eyşeyê qet napirse bê ka ew dixwaze an naxwaze bizewice. Çendî Eyşe û diya wê li dijî vê yekê radibin jî, wî biryara xwe daye. Eyşe bivê nevê jî dê bizewice.



Êvarê du mêr û jinek tên malê ku Eyşe berê ew qet nedîtine. Gava ew li odeya rûniştinê sohbet dikin, bavê Eyşeyê jê dixwaze ku qehweyê çêke. Ji mêran ê xort, tim di bin çavan re li Eyşeyê dinêre. Ew mêrikê hinekî kal, dawiyê dibêje: "Bi emrê Xwedê, bi qewlê Resûlê Ekrem, em keça we ji bo lawê xwe dixwazin." Piştî gotina bav ku dibêje "Min da û qediya", zewaca Eyşeyê ya bi wî zilamî re, ku ew wî qet nas nake, qethî dibe. Eyşe zêde nikare xwe ragire û dest bi girînê dike.

Li bavê xwe difetile, dibêje: "Dilê min û zewacê tune ye. Hûn nikarin min bi zorê bizewicînin." Bav bi awayekî pir bi hêrs, ji cihê xwe radibe. Eger diya wê nekeve navberê, dê şîrqamekê deynê. Paşê ji xwezgîniyan re jî dibêje: "Hûn qet meraqan mekin, hinekî naziyan dike. Ez ê wê razî bikim."

Hazirî bi awayekî lez û bez tên kirin. Eyşe dê li mala xesûya xwe bijî. Di vê navê de Eyşe tim digirî, xwarinê naxwe û xew bi çavan nakeve. Ji bo ku diya wê aliyê wê bike, jê lavahiyan dike. Diya wê jî, ku ew bêyî dilê xwe bi usûla xwezgînîtiyê hatiye zewicandin, li dawiyê pişta keça xwe dike. Paşê bi hev re difikirin ka dikarin serî li ku derê bidin.

Eger Eyşe nekaribûya serî li polîsxaneyê bida, li şûna wê kesekî ku ji rewşê agahdar e jî (wekî xizm û lêzimekî wê, cînarekî wê yan jî mamosteyek) dikaribû serî li rayedaran bixista.





Biryar didin ku li Navenda Şêwirê ya Jinan bigerin ku bi ser şaredariyê ve ye. Ew kesê dîdarî pê re hatiye kirin, dibêje nabe ku kesek bi zorê bê zewicandin. Diyar dike ku çûna muxtariyê jî ne çare ye û der barê vê mijarê de jî tu rayeya muxtar nîn e. Teklîf li wan dike ku ew serî li dozgeriyê bidin, lê ji ber ku cihê mehkemeyê dûr e, naxwazin wext li wan teng bibe. Li ser vê yekê biryar didin ku herin polîsxaneya herî nêz. Ji karmendê şaxa zarokan re rewşê vedibêjin û zeptekê pê didin nivîsandin. Jê re dibêjin ku ew gilîkar in. Karmendên li polîsxaneyê îfadeyên ku girtine tafilê digihînin dozgera zarokan. Dozgerî gazî bavê Eyşeyê dike û îfadeyên wî distînin.

Dozger Xanim bi bavê wê re dipeyive û dibêje ku bêyî rizaya keça xwe ew nikare wê bi zorê bizewicîne û jixwe ev yek jî sûc e. Diya wê jî dibêje ew li pişta keça xwe ye û ji bo ku ew bi zorê neyê zewicandin, dê jê re bibe piştgir. Piştî bav dibîne ew neheq e, dev ji zewicandina keça xwe berdide.

**Eger Eyşe 15 salî yan jî hîn biçûktir bûya, dê dozger rasterast biryara tedbîrî bistanda û dê ev biryar bişanda Gerînendetiya Bajêr a Polîtîkayên Civakî û Malbatî. Di rewşeke wiha de Mudiriya Bajêr, herî zêde di nav 5 rojan de dikare lêkolînekê bike û eger hewce bibîne jî, ji bo Eyşeyê dikare biryara hêvişandinê bide standine.**

EGER EYŞE DERENG BIMAYA NEÇÛYA POLÎSXANEYÊ Û BI ZORÊ BIHATA ZEWICANDIN, WÊ GAVÊ MAFÊ WÊ HEBÛ KU EV TIŞT BIKIRANA:

- Gava karmendê nîkehê ji Eyşeyê bipirsiya ka ew dixwaze bizewice yan naxwaze, dikaribû bigota “NA” û kesî nikaribû zor bidayê da ku bibêje “ BELÊ.”
- Eyşeyê dikaribû têkiliya zayendî red bikira. Eger digel vê yekê têkiliya zayendî pêk bihata, hingê dikaribû serî li dozgeriyê bida û ji ber duçarbûna tecawizê ya li navzewacê gilî bikira (Qanûna Ceza, xal 102).
- Her wiha dikaribû ji ber zewicandina bi zorê jî serî li dozgeriyê bida û gilî bikira. Li gorî rewşê, ji ber sûcên wekî gef û sînordarkirina azadiyê dikaribû doza ceza bida vekirin (Qanûna Ceza, xala 106, 109).
- Eyşeyê dikaribû serî li Dadgeha Malbatî bida û ev zewac bida BETALKIRIN (Qanûna Medenî, xalên 149, 150 an jî 151).

Jineke ku bi zorê hatiye zewicandin, eger bixwaze hukmê vê zewacê nemîne, divê di firsenda ewilî de serî li meqamên fermî bixe.

**BALDARÎ**

Ku tesîra tirsê ji ser we rabû bi şûn de, di nav şeş mehan de divê hûn doza betalkirinê vekin. Doza îptalkirinê di nav pênc salên zewacê de dikare bê vekirin (Qanûna Medenî, xal 152). Piştî pênc salan bi şûn de, divê ne doza îptalkirina zewacê lê ya berdanê bê vekirin.

# DER BARÊ HEVBERDANÊ DE MAFÊN ME YÊN QANÛNÎ ÇI NE?

Ji ber sedemên wekî zîna, qesta li jiyanê, reftarên nebaş an jî yên rûmetşikên, sûckirin û domandina jiyaneke bêrûmet, terk, nexweşiya hişî û zerargihîştina yekîtiya zewacê, mafê me heye ku em biryara berdanê bidin. Tu kes nikare zorê li me bike da ku em zewaceke bêyî dilê xwe bidomînin. Eger em bi mafên xwe yên di wexta berdanê û piştî wê de bizanibin, dê ew bi kêrî me bên da ku em bikaribin vê pêvajoyê hem ji bo xwe hem jî ji bo zarokên xwe (ku zarokên me hebin), bi rihetî derbas bikin.

## Sedemên Hevberdanê

- **Jiyîna cihê:** Hûn zewicandî ne û hûn dixwazin ji hevserê xwe cihê bijîn. Hûn dikarin xaniyekî din bigirin û li wir bijîn. Kes nikare zorê li we bike da ku hûn vegerin mala xwe ya ku hûn digel hevserê xwe lê dijiyan. Tenê hevserê we dikare bi nivîseke fermî ya ji dadgehê, we dawetî malê bike. Li ser vê yekê, eger hûn venegerin malê, ji ber sedema “terkkirinê” dikare doza berdanê li we veke. Eger hûn berdana xwe nexwazin, bi îsbatkirina mafdarbûna sedema terkandina malê, hûn dikarin redkirina dozê bixwazin. Eger na, dibe ku hûn ji mafên wekî nefeqe, tezmînata madî û manewî îstifade nekin. Hûn dikarin ji dadgehê jî biryara jiyîna cihê derxin. Ji bo derketina vê biryarê, divê hûn yek ji sedemên hevberdana taybet ên wekî zîna, qesta li jiyanê, reftarên nebaş û yên rûmetşikên nîşanî dadgehê bidin. Dadger, ji ber van mercan, dikare biryara cihêbûnê ya ji bo salekê heta sê salan bide (Qanûna Medenî, xal 171-172). Di vê rewşê de, eger hevserê we doza berdanê veke jî, ji ber ku hûn cihê dijîn hûn nakevin rewşeke neheq û hûn dikarin ji mafên xwe yên wekî nefeqe, tezmînata madî û manewî jî feydedar bibin.

- **Terkkirin:** Eger hevserê we terka malê kiribe, ji ber “terkkirinê” hûn dikarin dozê vekin (Qanûna Medenî, xal 164). Her wiha, eger hevserê we zorê bide we ku hûn terka malê bikin, berî we bide derveyî mal yan jî nehêle ku hûn vegerin malê, ev jî wekî ku terka malê kiriye tê hesibandin.
- **Qesta li jiyanê - reftarên nebaş an jî yên rûmetşikên:** Qesta li jiyanê (tevgerên ku bi niyeta kuştinê tên kirin ên wekî birîndarkirina giran, lêdana bi kêran, jehrdayîkirin) yan jî tevgerên rûmetşikên ên zêde giran (mîna lêdan, tehde, pêkanîna têkiliya zayendî ya bi zorê û heqaretên giran) jî sedemên berdanê ne (Qanûna Medenî, xal 162). Her wiha ev kirinên hanê hemû jî sûc in. Eger ji van reftaran yek jî li we bê kirin, hûn wekî din jî dikarin serî li dozgeriyê bixin û ji bo vekirina doza cezayê gilî bikin.
- **Tecawiza li navzewacê:** Li gorî Qanûna Ceza, tecawiza li navzewacê sûc e.We divê hûn bi dilê xwe zewicîbin an jî bi zorê zewicîbin, ev yek tesîr li rewşê nake. Eger em nexwazin, hevserê me nikare bi me re bihevrebûna zayendî pêk bîne yan jî nikare ji bo vê yekê zorê li me bike. Eger vê bike, tê cezakirin. Ji bo îsbatkirina tecawizê eger delîlên fizîkî yên mîna cihê zorlêbûnê û morahiyê neyên dîtin jî, raporên psîkolojîk ji bo vê yekê dikarin bên bikaranîn. Ji bo gilîkirina tecawiza li navzewacê jî, tenê hewce pê heye ku hûn daxwaznameyê bidin dozgeriyê. Hevserê ku tecawiz kiriye, bi girtîtî tê mehkemekirin.
- **Kirina sûc û domandina jiyana bêrûmet:** Eger hevserê we sûcekî giran ê ku we pê biçûk bixîne kiribe (wekî xapînekî û tecawizê) yan jî mîna ku di qanûnê de heye, jiyaneke wî ya bi awayê domandina jiyana bêrûmet hebe (mîna alkol, mubtelabûna madeyên kêfder û kirina bazirganiya jinan), hûn dikarin bidin xuyakirin ku jiyana pê re nayê kişandin û doza berdanê lê vekin (Qanûna Medenî, xal 163). Di vê rewşê de, eger zarokên we hebin, welayeta zarokan didin we.
- **Ji binî ve têkçûna zewacê:** Bêyî ku bûyereke diyar biqewime, bi tenê ji ber têkçûna zewacê jî hûn dikarin doza berdanê vekin (Qanûna Medenî, xal 166). Ji bo vê rewşê, hinek be jî divê ku hûn bikaribin tevgerên hevserên xwe yên xerab ên ku bûne sedema vekirina doza berdanê, îsbat bikin. Mesela, ji bo pêkanîna tevgerên zayendî yên bêyî dilên we, eger bi riya şidetê zor li we bê kirin, ev yek dibe sedema mijara berdanê.

## Welayeta Zarokan di Wexta Hevberdanê de

We biryar da ku hûn ê berdana xwe bixwazin an jî cihê bijîn, nexwe dê îcar rewşa zarokan çi be? Di vê rewşê de, dadger baweriya xwe bi kê bîne ku ew ê baştir li zarokan xwedîtiyê bike, wê welayetê bide wê/wî. Tu raseriya hevserê we li we nîn e. Berevajiyê vê yekê, bi awayekî giştî biryar tê dayîn ku zarok bi diya xwe re bîmînin û dîsan ji bo ku xwişk û bira (ango zarok tev) jî digel hev mezin bibin, biryar li ser mayîna wan a bi hev re tê dayîn. Zewaca we ya ji nû ve jî, nabe sedema jidestdana welayeta zarokên we (Qanûna Medenî, xal 349). Eger ji ber tundiyê hûn ji hevserê xwe cuda bûbin, dadger zû îqna dibe ku nabe mirov zarok teslîmî bavekî wisan bike.

Piştî biryardana welayetê, dadgeh bi xwe biryar dide ku dê zarok bi çi awayî aliyê din bibîne. Eger li vê biryarê rîayet neyê kirin, mirov dikare doza cezayê veke û eger mafê welayetê jî bi awayekî xerab bê bikaranîn, ji bo pêkanîna guhartinê jî mirov dikare serî li dadgehê bixe.

## Di Rewşa Jiyîna Cihê û Hevberdanê de Nefeqe û Tezmînat

- **Nefeqeya tedbîrê:** Gava hûn ji ber sedemeke mafdar cihê bijîn, ji bo zarokên xwe û heta di rewşên musaîd de ji bo xwe jî, hûn dikarin doza nefeqeya tedbîrê vekin (Qanûna Medenî, xal 197/2, 3, 4). Heta ku doza hevberdanê yan jî ya cihêbûnê bidome, dadger ji ber xwe ve jî dikare hukmê dayîna nefeqeya tedbîrê bide. Yanê hewce nake hûn bi awayekî taybet vê yekê bixwazin. Lê dîsan jî dibe ku li dadgehê hûn vê yekê bi bîr bixin. Nefeqeya tedbîrê, ji dema destpêka dozê ve tê dayîn û heta bidawîbûna dozê didome.
- **Nefeqeya xizaniyê:** Bêyî ku sedemeke mafdar hebe, we terka malê kiribe û ji ber hevberdanê jî eger hûn ê bikevin nav xizaniyê, di wexta dozê de hûn dikarin nefeqeya tedbîrê û piştî ku biryara berdanê qethî bû bi şûn de jî, nefeqeya xizaniyê daxwaz bikin (Qanûna Medenî, xal 175). Li ser vê daxwazê dadger dikare li gorî rêjeya enflasyonê biryara her sal a zêdekirina nefeqeyê bide yan jî biryara dayîna liserhev a nefeqeyê bide.
- **Nefeqeya beşdariyê:** Her wiha, ew aliyê ku welayeta zarokan nedanê, li gorî hêza malî mukelef e ku beşdarî li mesrefên debar û perwerdehiyê ya zarokan bike. Ji vê nefeqeyê re, ku li leha zarok hatiye girêdan, nefeqeya îştiraqê tê gotin. Tu eleqeyeke nefeqeya zarokan, bi rewşa qisûrê ya dê û bav re nîn e.
- **Biryara şerha rûniştgeha malbatê:** Dadger di dema berdewamiya dozê de, dikare li ser bikaranîna xanî û eşyayên hevpar a ji bo we û zarokan, biryar bide. Eger xaniyê hevpar milkiyeta hevserê we be, dikare biryara şerha rûniştgeha malbatê û ji bo malên guhêzbar û neguhêzbar biryara tedbîrê hilde.
- **Tezmînata madî û manewî:** Eger hûn mafdarbûna xwe îsbat bikin, hûn ê bikaribin tezmînata madî û manewî bistînin. Tevî tezmînata madî û manewî, hûn dikarin nîvê gerewa malên xwe yên ku we di wexta zewacê de bi dest xistine jî bixwazin. Reftarên mîna xapandin (a bi yekê re) û lêkirina şidetê, wek sedemên tezmînata madî û manewî tên hesibandin.
- Eger hûn di dema doza hevberdanê de, di daxwazên xwe yên nefeqeyê yan jî tezmînatê bibihurin, piştre hûn nikarin **dev ji biryara xwe berdin**. Nefeqeya beşdariyê ya ji bo zarokan, ne tê de ye.

Eger hevserê we nefeqeyê di wexta diyarkirî de nede, hûn dikarin serî li dadgeha îcrayê bixin û li ser hev jî bistînin. KU NÎKEHA WE YA FERMÎ TUNE BE, HÛN NIKARIN NEFEQEYÊ BIXWAZIN.

Ji bo ku hûn daxwaznameya berdanê bidin, ne şert e parêzerekî/e we hebe. Ji bo vê yekê, ji komîsyona mafên jinan a baroya bajarê xwe, hûn dikarin xizmeta rêberiyê/şêwirmendiyê BÊMIZE bistînin.

# REJÎMA MAL

Tapo yan jî ruxset li ser kê dibe bila bibe, dîroka nîkeha fermî çi dibe bila bibe, malên ku di berdewamiya zewacê de hatine bidestxistin, nîvê wan ê jinan e! Navê rejîma mal a ku ji 1'ê Kanûna Paşîn a 2002'yan ve tê sepandin, **Rejîma Beşdariya Li Malên Bidestxistî** ye. Li gorî vê, di rewşa bidawîbûna zewacê de (ji ber mirin an jî hevberdanê) her tiştê ku malbatê ji 1'ê Kanûna Paşîn a 2002'yan bi vir de bi dest xistiye, di navbera jin û mêr de bi awayekî yeksan tê parîkirin.

Ji wan qaydeyan re rejîma mal tê gotin ku ew di berdewamiya zewacê de teserûfa mal û ji ber hevberdan an jî derbasbûna rejîmeke din a mal, parîkirina wekhev a mal a di navbera hevseran de sererast dike.

## Rejîma qanûnî ya mal çi ye?

Rejîma qanûnî ya mal, ji bo rewşên wisan ku hevseran ji bo hilbijartina rejîmeke din a mal li hev nekiribe, navê rejîma mal e ku (ji dema birîna nîkaha resmî, ji ber xwe ve) derbasdar e.

## Rejîma beşdariya li malên bidestxistî çi ye?

Piştî encama dawîlêhatina zewacê ya ji ber sedemekê, navê wê DI NAVBERA JIN Û MÊR DE BI AWAYEKÎ WEKHEV PARÎKIRINA MALÊN BIDESTXISTÎ YÊN DI BERDEWAMIYA ZEWACÊ DE ye! Fikira vê yekê ew e ku, karên jin li malê dikin jî xwedî nirxeke madî ne. Em li derve bixebitin jî nexebitin jî, bi piranî em gelek berpirsiyên wekî hilanîn û danîna malê, xwedîkirina zarokan, nêrîna li nexweşan digirin ser xwe. Îcar em van berpirsiyan bêyî ku garantiyeke me ya civakî û destûra tatîlê hebe, bi salan tînin cih. Rejîma beşdariya li malên bidestxistî, tenzîma wê yekê ye ku dixwaze keda jinan a nexuyakirî ya ji ber kirina karên nav malê û di nav malbatê de jî wekî xizmeta li zarok, nexweş û pîr û kalan bide xuyakirin û armanca dayîna bergind û gerewa van xizmetan li xwe digire. Ji lew re, ev karên ku hatine jimartin, eger li derve bihatina kirin, hewce bû ji bo wan mizeyek bihata dayîn. Lê jin bi giştî van karan bêmize dikin û bi vî awayî jî nîvê butçeya malbatê bi keda xwe pêk tînin.

A ji ber vê yekê, beriya guherîna Qanûna Medenî ku rejîma mal jî li xwe digirt, rêxistinên jinan pir hewl da ku ji bo hemû zewacan, da bibe qanûn ku ji roja pêşîn a zewacê ve ew malên di berdewamiya zewacê de bi dest hatine xistin, bi awayekî wekhev di navbera jin û mêr de bên parvekirin. Di pêşnûmaya qanûnê de jî parvekirina wekhev a malên bidestxistî dihat xwestin. Lê li Meclîsê bi guhartina deqeya dawî, biryar hat dayîn ku rejîma mal piştî 1'ê Kanûna Paşîna a 2002'yan li zewacên heyî û li zewacên nû bê sepandin.

**Rejîma beşdariya li malên bidestxistî çawan tê sepandin? Em mînakekê bidin:**

Asiye û Ehmed zewicîn. Beriya zewacê du zeviyên Ehmed hebûn ku ji malbata wî jê re mabûn. Di dawetê de jî zêr û bazin bi Asiyeyê ve hatin kirin. Piştî zewacê, wan ji zeviyan yek û çend heb jî bazinên Asiyeyê firotin û wan dikanek ji xwe re kirî. Ehmed deh sal dikan xebitand. Asiyeyê jî karê malê kir û li zarokan nêrî. Wan zeviyek û traktorek jî kirî. Paşê jî wan hev berda.

**Eger Asiye û Ehmed di 2002'yan de yan jî piştî wê zewicîbin...**

Dadger dê malên arizî cuda bike û yên ji derî van, yanê malên bidestketî li wan parve bike.

Ango:

- Ew zeviya ku berî zewacê Ehmed xwediyê wê bû, wek malê arizî yê Ehmed tê hesibandin. Xelatên ku di dawetê de bi Asiyeyê ve hatine kirin jî, malê wê yê arizî ne. Ev nayên parvekirin. Malê her kesî jê re dimîne.
- Lê piştî destpêkirina zewacê, ew dikanên ku bi firotina yek ji van zeviyan û bazinan hatiye kirîn, wek malên bidestketî tên hesibandin. Asiye û Ehmed, di wexta kirîna dikanê de nirxên malên xwe yên arizî yên ku dane, wek para beşdariyê dikarin bi paş ve bistînin. Piştî jêkuştina bihayê van malên şexsî, bedêla dikanê ya mayî, bi awayekî wekhev di navbera wan de tê parvekirin. Dahata ku ji dikanê hatiye bidestxistin, zevî û traktora ku bi vê dahatê hatine kirîn jî, bi tevahî wek malên qazanckirî tên hesibandin û bi yeksanî tên parîkirin.

<u>**Di rewşa mirinê de:**</u> Ji ber ku nîvê malan û dahatan ên Asiyeyê ne, dê nekevin ber mîratê. Nîvê din jî dê di navbera sê kesan de, ango di navbera Asiye û du zarokên wê de bên parvekirin.

**Eger Asiye û Ehmed berî 2002'yan zewicîbin...**

Dadger dê malan wiha parve bike:

Malên ku beriya 2002'yan hatine kirîn:

- Tapoyê dikanê li ser Ehmed e, nexwe ew ê ji Ehmed re bimîne.
- Zeviya ku ji malbatê ji Ehmed re maye, dîsan li ser Ehmed e. Ew jî ew ê ji Ehmed re bimîne.
- Lê dahatên ji vê dikan û zeviyê yên piştî 1'ê Kanûna Paşîn a 2002'yan dê bi awayekî wekhev bên parîkirin.

Malên ku di 2002'yan de û piştî wê hatine kirîn:

- Bedêla zevî û ya traktorê dê di navbera Asiye û Ehmed de bi wekhevî bê parvekirin. Eger dahatên van ên civiyayî hebin, ev dahat jî dê bi awayekî wekhev bên parvekirin.

**Di rewşa mirinê de jî:** Ji ber ku nîvê malan û ya dahatên ku piştî 2002'yan hatine bidestxistin ên Asiyeyê ne, dê nekevin ber mîrasê. Nîvê din jî dê di navbera sê kesan de, yanê di navbera Asiye û du zarokên wê de bên parvekirin

Li gorî rewşa niha, rejîma mal a di Qanûna Medenî de, li zewacên derbasdar ên ku wexta qanûn ket meriyetê, yên beriya dema 1'ê Kanûna Paşîn a 2002'yan, nayê sepandin. Lê bi vî halî Qanûna Medenî li dijî Makeqanûnê ye û divê sererastkirin bi awayê ku dema beriya 1'ê Kanûna Paşîn a 2002'yan jî bigire nav xwe, bê guhartin. Ji ber ku Dadgeha Makeqanûnê serlêdana der barê vê mijarê de red kiriye, ev mijar heta 10 sal piştî vê biryarê, yanê di sala 2018'an de dikare were rojeva Dadgeha Makeqanûnê. Ev neheqî hîn jî di rojeva tevgera jinan de ye û ji bo guhartina wê jî xebat didomin.

ÊDÎ QANÛN QÎMETA KEDA JINAN A NAV MALÊ QEBÛL DIKE: QANÛN DIBÊJE KU, **JIN BI XEBATA XWE YA NAV MALÊ YAN JÎ YA DERVEYÎ MALÊ, BI NIRXEKÎ YEKSAN A ABORÎ BEŞDARÎ LI JIYANA MALBATÊ Û LI MALÊN KU MALBATÊ EW BI DEST XISTINE DIKE.** LOMA HEQÊ WÊ LI SER NÎVÊ VAN MALAN HEYE.

# TUNDIYA LI DIJÎ JINAN Û MAFÊN ME

Çendî gava tundiya li dijî jinan bê gotin, tundiya fizîkî ango lêdan, birîndarkirin û kuştin bê hişê mirov jî, lê gelek cureyên tundiyê hene. Wek mînak, destûrnedana ku jin li derveyî malê bixebite, destdanîna ser dahata wê, nehiştina ku ew malbat an jî hevalên xwe bibîne, heqaretkirin yan jî bêyî dilê wê bi zorê pê re pêkanîna têkiliya zayendî jî şidet e. Îro ji ber tundiya fizîkî, hestî, psîkolojîk û aborî ya zayendî yan jî geflêxwarina bi şidetê, ji her derdorê bi milyonan jin di bin pest û pêkutiyê de ne, ew hîn kêmtir tevî jiyana civakî dibin, bi zorê tên zewicandin, seqet dimînin an jî tên kuştin. Îcar gava tundî di nav malê de pêk tê, tesîra wê hîn xerabtir dibe. Li Tirkiyeyê ji her 100 jinî, li 42'yê wan, an hevserê wan an jî kesê ku ew bi wan re ne, şideta fizîkî yan jî ya zayendî li wan dikin. Ev rêjeyeke gelek zêde ye û girîngiya pêzanîna mafên me yên li dijî tundiyê derdixe holê.*

## Cureyên Tundiyê

Şekilê tundiyê yê ku zêdetir tê zanîn û jê tê behskirin çendî tundiya fizîkî be jî, lê tundî tenê ne ew e. Tundiya hestî, psîkolojîk, aborî û ya zayendî jî dibe ku herî hindik bi qasî tundiya fizîkî biêş û jan be. Eger hûn duçarî yek an jî zêdetirî tevgerên li jêrê bibin, an jî bi wan gef li we bên xwarin, nexwe li we şidet tê kirin. Bêyî ku hûn wext li xwe teng bikin, hûn dikarin ji mafên xwe yên ku qanûn ew xistine bin temînatê, feyde bibînin.

**Tundiya fizîkî:**
Her êrîşa li dijî bedena me tundiya fizîkî ye. Kiryariyên wekî şîrqam, avêtina kulm û pihînan, hejikandin, hincirandin, şidandina qirikê, girêdan, kişandina por, têwerkirina tiştekî, birîndarkirina bi hacetekî bibir û qulker an jî bi çekên agirbar, îşkencekirin, zordayîna jiyîna di şertên nebisihet de, nehiştina feydedîtina ji xizmetên tenduristiyê û kuştin, dikevin nav terîfa şidetê.



Wekî ji cureyên din ên tundiyê re, ji tundiya fizîkî re jî nabe ku têgihên mîna tore, namûs, urf û adet bibin behane. Kesên ku ji ber sedemên wekî cil û bergên ku jinek ew li xwe dikin, cihê ku ew diçê, mirovê ku ew pê re axiviye, hebûna têkiliya derî zewacê, hemlemayîn, bakîrenebûn, nexwestina zewicîna bi wî kesî re ku malbat dixwaze, xwestina cihêbûnê û xwestina wê ya xebatê, şidet pêk aniye û ji ber vê yekê jî cezayên ku ew bên hildin, nayên sivikkirin.

* "Lêkolîna Şideta Li Nav Malbatê ya Li Dijî Jinan Li Tirkiyeyê", Gerînendetiya Giştî ya Statuya Jinan (KSGM), 2009. http://www.kadininstatusu.gov.tr/upload/mce/eski_site/Pdf/siddetarastirmaozetrapor.pdf

### Tundiya psîkolojîk (hestî):



Cureyê tundiyê yê ku ji bedena kesekî zêdetir siheta ruhî ji xwe re dike armanc, tundiya psîkolojîk e. Bi awayekî giştî, ji kirina mexsûsî carekê pirtir, kiryariyên berdewam wek tundiya psîkolojîk tên terîfkirin. Eger hûn bi kirinên wekî qîrkirin û berîna timî, tirsandin, çêrkirin an jî heqaretkirin, nehiştina dîtina malbatê, ya hevalan û cînaran, tehdedîtina ji ber awayê lixwekirina kincan, hepskirina nav malê, dûrxistina ji zarokan, ji ber kumreşiyê tim hiştina di bin kontrolê de, qiyaskirina bi kesên din re, zerardana eşya û heywanên ku ji wan hez dike, geflêxwarin, şantajkirin, zordana ji bo fikirîna bi eynî awayî rû bi rû bimînin, tê wê wateyê ku li we şideta psîkolojîk dibe.

Ji ber ku bi piranî tesîrên tundiya psîkolojîk bi çavan nayên dîtin, paxav pê nayê kirin, ev cure tundî dibe ku bi kes re birîn û êşên giran çêke. Bi kesên ku tundiya psîkolojîk li wan bûye, dibe ku nerihetiyên hestî, psîkolojîk ên mîna jiyana tim bitirs, xwe bêqîmetdîtin, depresyon, meyldariya xwekujiyê, mubtelabûn, hesta şerm û sûcdariyê, bêserûberiya xew û xurek û têkçûna têkiliyên civakî di wan de bên dîtin.

### Tundiya zayendî:

Her cure tevgera ku zayendîtiya mirov ji xwe re dike armanc û wan ji kirinên xwedî muhtewaya zayendî yên bêdil re duçar dihêle, tundiya zayendî ye. Îstismara zayendî ya zarokan, tecawiza nav zewacê/derî zewacê (ji bo têkiliya zayendî, zorlêkirina li kesekî/ê ya bêdil, bi awayê bêdil û bi kesê bêyî dilê xwe re, yan jî bi cismên biyanî êrîşa li organê zayendî), êrîşa zayendî (her cure temasa zayendî ya bêdil ku bi tecawizê bi encam nabe, wekî destavêtinê), tacîza zayendî (reftarên acizker ên devkî/nivîskî yên xwedî muhtewaya zayendî; wekî nimûne, name û mesajên bi telefonan ên ku îşaret bi tiştên zayendî dikin û mirovan aciz dikin), gihandina zerardayina li organên zayendî, bi zorê pê temaşekirina weşanên bi naveroka zayendî, bi awayê acizker nîşandana organên zayendî, zorlêkirina ji bo welidandin an newelidandina zarokan, bi zorê pê kirina kurtajê, zorlêkirina ji bo kirina fihûşê, zewicandina bi zorê, kontrola bekaretê û kirinên wiha wek tundiya zayendî tên terîfkirin.

Ne tenê kesên ku hûn wan nas nakin, ew kesê ku hûn pê re dijîn, yarê/evîndarê we yan jî hevserê we wexta hûn nexwazin, bi awayê bêyî dilê we ji bo têkiliya zayendî zorê li we bike, ev tecawiz û sûc e jî. Pêkhatina tecawizê ya nav zewacê, cezayê ku dê bê dayîn sivik nake. Her wiha, di rewşeke wisan de ku hişê we ne li serê we be, wek mînak gava hûn di bin tesîra alkol an jî îlacan de bin, jibîrveçûyî bin an jî di xew de bin, pêkanîna têkiliya zayendî jî mîna tecawizê tên hesibandin.

### Tundiya aborî:



Digel ku rewş guncan e, nedana heqê mesrefan, nedana pereyan, bi awayekî kêm dayîna pereyan, der barê dahat û mesrefên malbatê de nedana agahiyê, der barê mijarên madî de yên ku malbatê jî eleqedar dikin bêyî şêwirînê biryardana bi tena serê xwe, destdanîna ser mal û dahata kesan, astengbûna ji xebatê re, xebitandina bi zorê ya di karê bêdil de û reftarên wekî van şideta aborî ye. Tundiya aborî jî bi awayekî giştî mîna tundiya hestî, psîkolojîk ji kirin û kiryariyên yekcarî zêdetir, xwedî rewşeke berdewamî ye.

# QANÛNA JI BO HÊVIŞANDINA MALBATÊ Û RÊLIBERGIRTINA TUNDIYA LI DIJÎ JINAN

Makeqanûn mafê jiyanê ya mirovan û tevahiya bedena wan hildide bin hêvişandinê. Em dikarin îhlalkirina tevahiya bedenê, wekî her cure tevgerên ku mafê me yê geşt û gerê sînordar dikin heta bi şidet û reftarên ku nahêlin der barê bedena xwe de em bi xwe biryarê bidin, rave bikin. Li gorî vê terîfê, her cure tundiya li dijî jinan, binpêkirina mafekî me yê Makeqanûnî û ya mafên mirovan ên jinan e. Ne tenê ji bo cezakirinê, ji bo berlêgirtina pêkhatina şidetê yan jî, ji bo bidawîanîna li tundiya berdewam jî berpirsiyên girîng ên ku dikevin ser milê dewletê hene.

Li gorî Qanûna Ji Bo Hêvişandina Malbatê û Rêlibergirtina Tundiya Li Dijî Jinan, a bi hejmara 6284'an terîfa tundiyê wiha ye: Ji aliyê fizîkî, zayendî, psîkolojîk an jî aborî ve zerardîtina mirovan an jî tevgerên ku dibin sedema êşkişandinê yan jî muhtemel e ku bi êşkişandinê bi encam bibe, geflêxwarin û tehdeya ji bo vê yekê yan jî bi awayekî kêfî astengkirina azadiyê jî tê de, her cure helwest û reftarên fizîkî, zayendî, psîkolojîk, devkî yan jî aborî ne ku ew di warên civakî, gelemperî û taybet de diqewimin.




Ji bo gelek jinên ku di nav malê de tundî li wan dibe, riya tek a filitîna ji tundiyê, terkkirina malê ye. Lê ji bo pirî jinan, ji ber sedemên cuda, ev yek dibe ku ne mimkun be. Di hin rewşan de, îcar hin jin hene ku digel şidet li wan dibe jî naxwazin terka malê bikin. Ji ber vê yekê Qanûna Ji Bo Hêvişandina Malbatê, ya bi hejmara 4320'î, ku di sala 1998'an de hatibû derxistin û bi navê **fermana hêvişandinê** dihat zanîn, digot ku yê ji malê were bidûrxistin divê ew kes be ku şidetê pêk tîne. Hem tecrûbeyên ku ji sepandina vê qanûnê hatine bidestxistin hem jî zêdebûna tundiya li dijî jinan û berbiçavbûna vê yekê, nîşan da ku hewcedarî bi qanûneke hîn berfirehtir heye. Digel gelek platformên jinan ên din, Platforma Bila Dawî li Tundiyê Were, ya ku nêzikî 300 rêxistinên jinan endamên wê bûn, bi hewldan û tevkariyên wan ên zêde ku di salên 2011 û 2012'an de dabûn nîşandan, di 8'ê Adara 2012'an de qanûneke nû hat qebûlkirin ku ew rewşa pêşketî ya qanûna bi hejmara 4320'î ye. **Qanûna Ji Bo Hêvişandina Malbatê û Relibergirtina Tundiya li dijî Jinan**, a bi hejmara 6284'an, mebesta wê ew e ku jinên şidet li wan dibe yan jî yên ku di bin talûkeya duçarbûna vê yekê de ne û ferdên malbatê biparêze. Ev qanûna hanê, ku hîn jî kêmasiyên wê yên girîng hene û wek "Qanûna Tundiyê ya Nû" tê zanîn, Peymana Stenbolê, ku me berê jê behs kiribû, ji xwe re wek bingeh hildabû û wisan hate amadekirin.

## Eger şidet li we dibe, yan ew talûke hebe yan jî yek bi israr taqîba we bike, hûn ê çawan bikaribin vê qanûnê bi kar bînin?

SERÊ PÊŞÎN LI XETA 155'AN A "HAWAR POLÎS" AN JÎ LI YA 183'YAN "ALO TUNDÎ"YÊ BIGERIN!

1. Ji bo xwehêvişandina ji tundiyê, yek ji tiştên ku hûn dikarin bikin jî, derxistina biryara tedbîrê ye (hûn dikarin agahiyên der barê biryara tedbîrê de, di qutiya rûpela 26'an de bibînin). Ji bo derxistina biryara tedbîrê hûn dikarin serî li navenda polîsan, li qereqola cendirmeyan, li qeymeqamtiyê yan jî li Dadgeha Malbatî bidin. Eger ji ber hin sedeman hûn bi xwe nikaribin serî lê bidin, nasekî we, cînar an jî mirovekî we jî dikare li şûna we serlêdanê bike. Ne hewce ye ku serlêdan rû bi rû bê kirin.



2. Biryara tedbîrê ji bo vê yekê ye ku we ji tundiyê, ji xetereya tundiyê dûr bihêle û divê di demeke herî kin de bê standin. Loma jî di merheleya serlêdanê de, pêwîst nîn e hûn îsbat bikin ku şidet li we bûye. Her wiha mesrefa serlêdanê jî ji we nayê xwestin. Eger mize ji we bê xwestin, hûn dikarin red bikin. Eger hewce bike hûn tedawî bibînin û sîgorteya we ya tenduristiyê tune be, mesrefên we dê ji aliyê Sîgorteya Tenduristiyê ya Giştî ve bên temînkirin.

3. Di rewşên acîl de biryarên tedbîrê ji aliyê polîs û cendirmeyan ve jî dikarin bên standin, lê di roja kar a di pey de, ji qeymeqamiyê, walîtiyê yan jî dadgerê Dadgeha Malbatê re tê pêşkêşkirin da ku pesend bikin. Tedbîrên ku tên standin, eger ji aliyê dadger ve di nav 24 saetan de û ji aliyê amirê mulkî (qeymeqamî, walîtî) ve jî di nav 48 saetan de neyên pesendkirin, nederbasdar dibin. Biryarên ku ji Dadgeha Malbatê hatine standin, dibe ku hem der barê jin an jî mêr de bin ku yekî ji wan tundî pêk aniye.

Eger tundî li we dibe, ewlehiya canê we tune be, li gorî we riya tekane ya bidawîanîna li şidetê terkkirina malê be, hûn dikarin herin stargehên bi ser rêxistinên jinan ên serbixwe yan yên şaredariyan an jî yên mêvanxaneyên Wezîriya Malbat û Polîtîkayên Civakî. Ji ber ku cihên stargehan û mêvanxaneyan nayên aşkerakirin, divê hûn li navenda jinan a şêwirînê, şaredarî, Gerînendetiya Giştî ya Xizmetên Malbat û Civakê yan jî li xeta Alo 183'yan bigerin (der barê vê yekê de, agahî di rûpela 49'an de hene). Hûn dikarin tevî zarokên xwe jî herin van deran. Gava hûn çûn eger mimkun be bi xwe re nasnameya xwe û eger hebin ên zarokên xwe, her wisan çend parçe kinc û hin eşyayên sivik jî bibin. Li van navendan hûn ê di nav ewlehiyê de bin, hûn ê bikaribin desteka psîkolojîk wergirin, plansaziya dahatûya xwe bikin û der barê pêvajoyên qanûnî de yên ku dê bên destpêkirin, hûn ê bikaribin agahî û alîkarî jî bistînin.

4. Ew kesê tundî pêk aniye, ka rîayetî biryara tedbîrê dike yan na, bi riya şopîna teknîkî, dikare bê şopandin. Taqîba teknîkî jî, bi kelepçeya elektronîk an jî ya zendaneyê şopîna kesê ku şidetê dike yan jî îhtimala kirina wî ya şidetê heye û bi cîhazeke ku dişibe telefona destan jî kesa ku tundî lê dibe, dikare bên şopandin. Ew kesê rîayetî biryara tedbîrê neke, di navbera 3-10 rojan de cezayê hepsê yê zorlêkirinê dixwe. Wek nimûne, li gorî biryara tedbîrê, ew mêrê ku şidet li jinikê kiriye divê bi tu awayî xwe negihînê û pê re nekeve têkiliyê, eger bi telefonê lê bigere, cezayê hepsê dixwe ku ew ji 3 rojan heta10 rojan diguhere.

Piştî vî cezayî, dîsan rîayetî biryarê neke, cezayê hepsê yê zorlêkirinê, her carê di navbera 15-30 rojî de dubare dibe. Lê nabe ku wexta hepsa zorlêkirinê ji 6 mehan bibihure.

## Biryarên tedbîrê çi li xwe digirin?

Biryarên tedbîrê, li gorî pêdiviya jina ku tundî lê dibe yan jî talûkeya lêbûna tundiyê hebe, tedbîrên girîng ên wekî

- temînkirina hêvişandina demkî
- cihê lêhewînê
- alîkariya madî ya demkî
- guhartina cihê kar
- dûrxistina mêrê ku tundiyê li jinikê dike û qutkirina danûstandina pê re
- ji aliyê mêr ve yê ku şidetê pêk tîne, dayîna nefeqeyê
- li gorî bernameya hêvişandina şahid, guhartina agahiyên nasnameyê
- li kutika tapoyê danîna şerha rûniştgeha malbatê
- û xizmeta kreşê

li xwe digirin.

Dadgeha Malbatê, li gorî taybetiyên rewşê, ji bilî tiştên ku di qanûnê de hatine nivîsandin jî dikare biryara tedbîrê bide. Wek mînak, ji bo dayîna fatureyên av û elektrîkê û ji bo ku nehêlin mêrê tundiyê pêk tîne nêzî malbata jinikê û nasên wê bibe, dikare biryarên tedbîrê bide.

Eger ji bo alîkariya madî biryarê bide, heta ji 30’yan yekê mizeya mehane ya kêmtirîn, diravdayîna rojane bê dayîn. Wek veser ji bo her kesekî/ê, bi rêjeya ji sedî 20’ê vê mîqdarê dîsan dirav tê dayîn. Ango eger bi we re du zarokên we hebin, ji bo her yekê pere tê dan. Ji bo kesa ku hêvişandina wê bê temînkirin, ev meblax dadikeve nîvî. Ev diravdayîn mehek bi şûn de ji wî kesê ku şidetê pêk tîne, tê standin.

# JINEKE KU TUNDÎ LÊ DIBE DIKARE ÇI BIKE?



Pênc sal bûn Fatme û Huseyn zewicandî bûn. Bi dilê xwe zewicîbûn. Salên pêşî, Fatme kumreşiyên Huseyn bi sedema ku “Ji ber ku ew ji min hez dike loma kumreşiyan dike”, şîrove dikir. Lê her ku diçû ev kumreşî zêdetir dibû û Fatme edi tehemul nedikir. Huseyn li Fatmeyê ziyareta xizm û lêzimên wê, çûna bazarê, xebat û heta hildana perdeyê jî qedexe kir.



Rojekê Huseyn bi awayekî pir bihêrs ket hundir. Hevalên wî yên taxê jê re gotibû ku wan dîtiye Fatme bi beqal re xeber daye. Fatme çi qas hewl dida jî hêrsa Huseyn danedikêt. Huseyn pêşî meseya xwarinê diqelêbe û piştre jî şîrqamekê datîne Fatmeyê, derî jî bi şid lê dide û ji malê derdikeve. Fatme qet tevgereke wiha ji mêrê xwe hêvî nedikir ku difikirî mêrê wê jê zehf hez dike. Pir tirsiyabû. Wê şevê tev, fikirî ka ew ê bikaribe çi bike. Lê Huseyn ber destî sibehê hate malê û bigirîn sond jê re xwar ku dê careke din tiştekî wiha neke û jê lêborîna xwe xwest. Li ser vê yekê li hev hatin.

Lê ev bûyera pêşîn, tenê destpêk bû. Wekî kumreşiyê, tehde û zora wî ya li Fatmeyê jî çi qas diçû zêdetir dibû. Gava Fatme ducanî bû jî, ev rewş neguherî. Di vê navê de piştî Huseyn ji kar hat derxistin bi şûn de, rewş heycar zortir bû. Bedêl çi dibû bila bibûya, êdî Fatmeyê dixwest xwe ji vê jiyanê bifilitîne. Lê ji ber rewşa bêperetiyê, nebûna meslek an jî sîgorteya wê ya civakî, zarokê li ber şîr û ji ber ku Huseyn tim ew taqîb dikir, xwe wek keseke bêçare didît.




Rojekê dotmama wê Nerîman hat serdana wê. Çendî Fatme ditirsiya û dixwest ku reş û morahiyên li mil û rûyên xwe yên ji ber lêdanê jê veşêre jî, lê Nerîmanê ew dîtin. Wê ji Fatmeyê re got ku ev ne qeder e, eger bixwaze ew dikare here gilî bike û heta jiyana xwe sererast bike jî dikare ji îmkanên wekî hewîn, alîkariya madî, sîgorteya tenduristiyê û zarokxaneyê îstifade bike. Fatme ku nedixwest êdî wiha bijî, îqna bû da ku tevî Nerîmanê here polîsxaneyê.

Bi hev re hema çûn polîsxaneyeke herî nêz. Polîsê ku li giliyên wan guhdarî kir, ji bo tafilê biryara tedbîrê bê derxistin, miameleyên pêwîst bêmize çêkirin û ji bo pesendê jî birin qeymeqamtiyê. Di vê navê de ji bo ku Fatme digel zaroka xwe lê bimîne, cihek dît û kir ku mesrefên wê yên tenduristiyê ji Sîgorteya Tenduristiyê ya Giştî bên temînkirin. Her wiha Fatme hem ji bo xwe hem jî ji bo bebeka xwe dest bi standina alîkariya madî kir. Digel vê rewşê, li Huseyn hatibû qedexekirin ku nêzî wê bibe û telefonî wê jî bike. Lê Huseyn guh nedabû vê biryarê, li Fatmeyê geriyabû, loma jî 5 roj cezayê hepsê lê hatibû birîn. Huseyn pê hisiya ku eger careke din lê bigere yan jî nêzî Fatmeyê bibe dê cezayê hepsê yê di navbera 15-30 rojî de bixwe, loma newêrî careke din eynî tiştî bike.



Fatme piştî ku hinek xwe da hev, beşdarî kursên meslekî yên navenda civakê bû. Ji aliyekî ve jî, ji bo ku careke din baweriya bi xwe bi dest bixe, desteka psîkolojîk distend. Ji ber ku li zarokxaneyê jî bêmize li bebeka wê dihat mêzekirin, di karê terzîtiyê de ku pir jê hez dikir şarezatiya xwe bi rihetî bi pêş ve dibir. Di dawiya salekê de, ew bûyerên lê qewimîbûn, êdî jê re wekî bîranîneke ne xweş mabû û ji xwe re karek jî peyde kiribû. Huseyn jî, piştî dadger ew şandibû bernameya kontrola hêrsbûnê, hînî riyên xwederbirînê yên bêyî şidetê bûbû û di têkiliyên xwe yên bi keça xwe re, dîqat dikir ku şaşiyên bi Fatmeyê re kirine, dubare neke. Êdî jiyan ji bo hemûyan xweştir bûbû.

Tundiya li jinan, cudakariyek e ku ji têkiliya hêza newekhev a di navbera jin û mêran de diqewime û ev jî binpêkirina mafên mirovan ên jinan e. Qanûna tundiyê ji ber ku rê li ber tundiyê bigire, êrîşkaran bitexilîne û jinan, zarokên wan û lêzimên wan ên ku duçarî tundiyê bûne û kesên şahidê tundiyê bûne bi awayekî kartêker biparêze, hatiye tenzîmkirin. Urf, adet, namûs, baweriya dînî nabe ku bibe sedema tund û tûjiyê.

# DI REWŞA TAQÎBA ISRARDAR DE EM DIKARIN ÇI BIKIN?



Zeyneb û Merd ji salên lîseyê ve di heman dibistanê de dixwendin û li heman taxê dijiyan. Di wexta lîseyê de wê bi qasî salekê bi Merd re hevaltî kiribû. Lê piştî Zeyneb ketibû zanîngehê, nexwestibû wekî berê zêde pê re bide û bistîne. Dixwest bala xwe bide dersên xwe û demên xwe yên betal jî li kulûba şanoyê ya zanîngehê derbas bike. Lê Merd di ezmûnên zanîngehê de beşa ku xwestibû kar nekiribû û daxwaza veqetînê ya Zeynebê jî kiribû ku reftarên wî yên kumreşî û yên sînorker heycar zêde xerabtir bibin.



Merd, bêrawest ji Zeynebê re mesaj dişandin û eger bersiv jê nestanda îcar her êvar 9-10 car telefonî wê dikir. Zeyneb fikirî ku eger bersiv nedê, dê dev ji kirina telefonan berde, lê Merd îcar dest pê kiribû li ber deriyê zanîngehê disekinî û gava Zeyneb bi hevalên xwe re bû, ew aciz dikir.

Piştî ku carekê Merd li ber pencereya Zeynebê kire qîrîn û berîn, malbata wê jî bi rewşê hisiya. Ji ber ku Zeyneb ditirsiya dê malbat pê re bixeyide û wê sûcdar bike, behsa vê yekê ji malbata xwe re nekiribû. Lê piştî malbatê lê guhdarî kiribû, jê re gotibûn ku ev ne sûcê wê ye, tiştê Merd kiriye sûc e. Gazin ji Zeynebê kiribûn ku çima berê behsa vê rewşê ji wan re nekiriye. Hewce nedikir wê bi tena serê xwe ev bêhizûrî û derd bikişanda.

Malbatê bêyî ku karekî din bike, lê xist çû Dadgeha Malbatê û li Merd gilî kir. Bi hildana biryara tedbîrê ya dadger jî, li Merd hat qedexekirin ku ew li Zeynebê bigere, jê re mesaj û e-posta bişîne û li nêzî mal û dibistana wê bigere. Bi sîstemên taqîba teknîkî jî dê bihata kontrolkirin bê ka li vê biryarê guhdarî dike yan na. Her wiha piştî nameya dadgehê ya der barê vê biryarê de gihîşt Merd, ew tirsiya. Qet nehatibû bîra wî ku ev tiştên dike, sûc in. Careke din qet hewl neda ku têkilî Zeynebê bibe.






Ji bo hûn ji qanûna tundiyê sûd wergirin, ne hewce ye ku hûn zewicandî bin. Jin, mêr, zarok, kesên gêran, zewicandî, ezeb, her kes dikare ji vê qanûnê sûd wergire. Kesê ku tundiyê pêk tîne, te divê ew şû/mêr, yar, bav, bira yan jî merivekî we be, qet tesîr li sepandina qanûnê nake.

## Rîayetkirin û rîayetnekirina li biryara tedbîrê, çawan tê şopandin?

Li gorî biryara tedbîrê ya ku dê bê standin, dibe ew kesê şidetê pêk tîne ji malê bê dûrxistin, heta dibe ew kesê ku bi rêbazên ragihandinê yên mîna telefon, mesaja kurt û e-postayê tundiyê dike, bê astengkirin da ku xwe negihîne te. Baş e, wê çawan bê şopandin bê ka ev biryar tên bicihanîn an na? Ev sepana ku di qanûnê de wek “taqîba teknîkî” derbas dibe çi ye?

Li gorî qanûna tundiyê ya nû ya bi hejmara 6284’an, taqîba teknîkî, bi navgîn û rêbazên teknîkî şopandina vê yekê ye ku dikare kesên tundiyê dikin an jî talûkeya wan a pêkanîna tundiyê heye, bişopîne.

Bi vê rêbazê, ew kesê tundiyê pêk tîne bi kelepçeyeke elektronîk an jî bi zendaneyekê tê tesbîtkirin bê ka li ku ye. Bi vî awayî jî tê zanîn ka ew nêzî kesê ku tundiyê lê kiriye bûye yan nebûye. Her wiha gerdeniyeke ku li serê bişkoja panîkê yan jî cîhazeke ku dişibe telefonê, didin kesa ku şidet lê dibe. Jin, bi vê dikare xeberê bide hêzên ewlekariyê ku êrîşkar nêzî wê bûye.

Ji ber sedema "veşarîbûna jiyana taybet", guhdarîkirina axaftinên kesê ku tundiyê pêk tîne yan jî qeydkirina dîmenên wî, nakeve nav miemeleyên taqîba teknîkî.

## Nexwe dê rewşa zarokan çi be?

Li gorî qanûna bi hejmara 6284'an, li ser zarokên kesa ku tundî lê dibe jî dikare tedbîr bên hildan. Wek nimûne, dibe li wî kesê tundiyê pêk tîne, bê qedexekirin da ku ew nêzî cihê ku zarokên wî lê ne û dibistanên wan nebe, ber lê bê girtin ku ew bi zarokên xwe re nede û nestîne û qeydên zarokan ên dibistanê jî veşarî bên hiştin. Li gorî qanûnê, eger zarokên jinikê hebin û nexebite, ji bo ku destek li beşdarîkirina wê ya jiyana kar bê kirin, ji bo wê 4 meh derfeta zarokxaneyê ya bêmize tê dabînkirin. Lê belê eger jin bixebite ev qewl bi 2 mehan tê sînordarkirin. Bi şertê ku mizeya zarokxaneyê ji nîvê mizeya kêmtirîn derbas nebe, ji budçeya Wezîriya Malbat û Polîtîkayên Civakî tê temînkirin. Her wisan, alîkariya madî ya demkî, ji bo her zarokê/a ku tevî jinikê di bin hêvişandinê de ye, ji sedî 20 zêde dibe. Xizmetên hewandinê bi awayê ku zarokan jî bigire nav xwe, tên dayîn. Dibe tedbîrên hêvişîner û destekker ên ku di Qanûna Hêvişandina Zarokan de hene, bên standin û mijarên wekî welayet, nefeqe û danîna têkiliyên şexsî jî bên tenzîmkirin. Eger der barê zarokan de, hîn berê dayîneke biryara danîna têkiliyeke şexsî hebe, dikare bê temînkirin ku danîna têkiliya şexsî digel refaqatdarekî/ê be, têkiliya şexsî bê sînordarkirin an jî bi temamî bê hildan.

# MAFÊN ME YÊN ZAYENDÎ Û QANÛNA CEZA YA TIRK

Têkoşîna tevgera jinên birêxistin, kir ku li Tirkiyeyê ji salên 1990'î bi vir de gelek guherînên qanûnî yên ku jinan eleqedar dikin pêk werin. Yek ji van a herî girîng jî Qanûna Ceza ya Tirk bû. Di Qanûna Ceza de, ku di sala 1926'an de ketibû meriyetê, jin wek malê civakê dihatin dîtin. Ezeb an jî zewicîbûna jinan, tesîr li dayîna sûcên zayendî dikir. Sûcên mîna tecawiz, tacîz û kuştinên ji ber namûsê, wekî ku pêwîst dikir, nedihatin cezakirin. Em piştî kampanyaya xwe ya ku sê salan domand, bi ser ketin û me karî ku em nêzî 40 madeyên Qanûna Ceza û zêhniyeta ku mafên mirovan ên jinan binpê dikirin, biguherînin.

Mebesta me ew bû ku Qanûna Ceza bi awayê nêrîna jinan bihata guhartin. Me dixwest ku qanûn tevahiya bedena me û mafên me yên zayendî biparêze. Di vê navê de, dest pê bû ku li Tirkiyeyê cara pêşîn têgiha "namûs"ê bi awayekî aşkera were nîqaşkirin. Gava kampanyaya me hewl dida ku qanûnan biguherîne, pê re jî şêweya nêrîna li jinan a civakê diguherî. Teşebûsa sivîl a tek, ku bi awayekî çalak tevî pêvajoya reforma Qanûna Ceza bû, tevgerên jinan û ya hemcînsbazan bû. Loma jî di vê pêvajoyê de mijarên herî zêde axaftin li ser wan dibûn, jin û mafên zayendî bûn.

Piraniya daxwazên me di Qanûna Ceza ya nû de, ku 1'ê Hezîrana 2005'an ket meriyetê, cih girtin. Qanûn, bi awayekî qismî be jî maf û azadiyên me hildan bin temînatê. Rewşa polîtîk çi dibe bila bibe, daxwazên me çendî ji mijarên "hesas" pêk bên bila bên, me dît ku her kampanya dikare bi têkoşîneke rêxistinkirî û domdirêj bi ser bikeve. Niha dor hatiye ser vê yekê ku em bikaribin mafên xwe yên ku me ew di encama têkoşîneke zehmet a sê salan de bi dest xistine, di jiyanê de pêk bînin.

Em dikarin bi kurtî guherînên sereke yên ku di Qanûna Ceza de, yên der barê naskirina tevahiya beden û mafên zayendî yên jinan de hatine kirin, wiha bi rêz bikin.



## Beden û zayendîtiya jinan bi tenê aîdî jinan e. Jin ne malên civakê ne.

Di Qanûna Ceza ya berê de jin wek ferd nedihatin dîtin. Beden û zayendîtiya jinekê, wek malê hevserê wê, malbat û civakê dihat hesibandin. Loma jî sûcên wekî tecawiz û tacîzê, mîna "reftarên ku ziyanê digihînin pergala civak û malbatê û exlaqê giştî" dihatin terîfkirin. Lê sûcên zayendî, sûcên wisan in ku wek ferd li dijî jinan dihatin kirin.

Di Qanûna Ceza de, ya ku niha di meriyetê de ye, ew ne wekî sûcên li dijî civakê lê belê wekî sûcên li dijî ferdan tên terîfkirin û di beşa **Sûcên li dijî Bêrîtiya Zayendî** de, tên cezakirin. Ev pêşketineke gelek girîng e, ji ber ku qanûn êdî jinan bi awayê ferdeke ku mafên wan ên tevahiya beden û zayendî hene dinase û wan diparêze.

## Sûcên li jinan tên kirin nabe ku bêceza bimînin

Di qanûna berê de sererastkirin dibûn sedem ku sûcên zayendî yên li hin li dijî jinan pêk dihatin, bêceza bimînin. Ji bo mînak, cezayê êrîşkar ê ku tecawizî jinekê kiribû, eger bi wê jinê re bizewiciya dihat bexişandin. Ew jina ku bi tecawizkar re dihat zewicandin, ku qanûnê ew serbest berdaye, bi tevahiya jiyana xwe ve duçarî tecawizê dihat hiştin. Di qanûna berê de, sûcekî bi navê tecawiza li navzewacê jî tune bû. Wisan dihat hesibandin ku mêrekî zewicî li gora dilê xwe dikaribû bi hevsera xwe re têkiliya zayendî daniya. Lê wî guh nedidayê bê ka jin bihevretiya zayendî dixwaze yan naxwaze.

Qanûna berê, li gorî rewşa medenî û bekaretê, di navbera jinan de cudakarî dikir. Wekî nimûne, cezayê revandina jineke ezeb ji revandina cezayê jineke zewicî siviktir bû. Ji lew re wisan dihat hesibandin ku jineke ezeb hîn bêhtir bêqîmet e. Niha ev hemû tenzîmên cudakar ji Qanûna Cezayê hatine derxistin. Li şûna wan, madeyên ku jinan wek ferdên wekhev dibînin û mafên wan dihêvişînin, hatin danîn.

## Êrîşa zayendî û tecawiz

Heta em nexwazin, heqê tu kesî nîn e ku tevgereke zayendî ya li dijî me pêk bîne. Di Qanûna Ceza de, sûcê êrîşa zayendî, wek îhlalkirina bêrîtiya bedenê ya mirov tê terîfkirin (xal 102). Cezayê vî sûcî, li ser gilîkirina kesê ku duçarî êrîşê bûye, ji du salan heta heft salan heps e. Ji bo cezakirina êrîşkar, ne hewce ye ku êrîş bi têkiliya zayendî bi encam bûbe. Wek nimûne, teşebûskirina ji bo tecawizê yan jî destavêtin, wek êrîşa zayendî tê pejirandin.

Tecawiz, sûcekî giran ê êrîşa zayendî ye. Ne tenê ew e ku organê mêraniyê bixin nav organê jinaniyê (ango penîs bikin vajînayê), çi organek an jî madeyek be jî gava ku bixin nav wicûdê, ew jî tecawiz e. Ev sûc, tecawiza oral û anal jî digire nav xwe. Qanûna Ceza, her cure tecawizê ji heft salan heta bi deh salan, bi hepsê ceza dike. Di wexta êrîşa zayendî de, eger sedemên ku sûc giran dikin hebin, cezayê hepsê tê zêdekirin.

Sedemên ku êrîşa sûcê zayendî giran dikin:

- Pêkanîna tundiya fizîkî
- Kirina tehde û pesta psîkolojîk
- Gefxwarin
- Zerardana bijûndariya bedenî yan jî psîkolojîk ya jinan
- Bi çek an jî ji yekî zêdetir, ji aliyê çend kesan ve pêkhatina sûc
- Di binçav de yan jî ji aliyê hêzên ewlekariyê ve, erkedarên dewletê, kardar an jî ji aliyê lêziman ve pêkhatina êrîşê.

# NABE KU JIN BI TECAWIZKARÊ XWE RE BÊN ZEWICANDIN



Elîf jineke 17 salî ya ciwan e. Gava li taxê tiştan dikire, kurê mêwefiroş tim wê taqîb dike û paşê jî teklîfa hevaltiyê lê dike. Elîf jê re dibêje ku dilê wê ne bi wî ve ye û pêşniyaza wî qebûl nake. Şevekê nîvê şevê zilamek di pencereya odeya Elîfê re dikeve hundir û tecawizî wê dike. Dê û bavê wê bi qîjîna wê re ji xew radibin û êrîşkar bi gelê taxê didin qefaltin. Êrîşkar lawê mêwefiroş e.

Piştî ku diya wê Elîfê hêmin dike, bêyî ku kincên li wê biguherîne, wê dibe binkeyeke bijûndariyê. Doktorê ku bi Elîfê re dipeyive hîn dibe ku wan



der barê vê yekê de gilî nekiriye, loma li polîsxane digere û bûyera tecawizê îxbar dike. Her wisan doktor ji Elîfê re behsa mafên wê yên qanûnî dike û dibêjê tecawiz sûcekî wisan e ku bêceza namîne. Hin kesên ji taxê aqil didin tecawizkar ku wan ew veşartiye, jê re dibêjin: “Eger tu bi Elîfê wî.” Mezinên malbata wê jî difikirin ku heta ew keça xwe nedin zewicandin dê bav ji şerman nikaribe pê biavêje qehwexaneyê. Bav dibêje ku dê nîkeha dînî li Elîfê bibire. Elîf xwe neqayîl dike û dibêje: “Yê sûcdar ew e, ne ez im. Hûn çima min ceza dikin?” Bavê wê dibêje: “Ji bo paqijkirina namûsa te.” Li ser vê gotinê Elîf dibêjê: “Ez ne namûs im, keça te me. Hûn nikarin min bi zorê bizewicînin. Jixwe eger polîs wî biqefêle, wî bernadin.”

Bav fehm dike ku eger keça xwe bi wî re bizewicîne, ku ew dê bi salan di girtîgehê de bimîne, bi kêrî tiştekî neyê. Di vê navê de êrîşkar hatiye girtin. Dotira rojê bav diçe qehweyê û ji kesên li wir re dibêje ku ew bi awayekî şaş qanûnê dizanin û eger êrîşkar bi Elîfê re bizewice jî, bi behaneya namûsê nikare xwe xelas bike. Ji wan re wiha dibêje: “Eger min li we guhdarî bikira, dê hem keça min di tevahiya jiyana xwe de îşkence bikişanda hem jî me dê bi malbatî sûcek bikira.”

Hefdeh sal cezayê hepsê li tecawizkar tê birîn. Elîf jî piştî ku demekê alîkariya psîkolojîk lê tê kirin, ji bo dest bi pîşeyê doktoriyê bike, ku gelek jê hez dikir, bi her çar lepan bi jiyana xwe digire û hişê xwe dide ser xwendina xwe.





## Eger em duçarî êrîşa zayendî bibin em ê bikaribin çi bikin?

Em dikarin hawarê daxin û ji kesên li derdorê alîkariyê bixwazin. Eger mimkun be, divê li polîs û cendirmeyan bigerin **(Hawar Polîs 155, Hawar Cendirme 156)**. Di rewşa her cure êrîşa zayendî de, bêyî bi derengî ketin, divê tafilê serî li navenda polîs, cendirmeyan û saziyeke herî nêz a bijûndariyê bê xistin.

- Eger şahidê ku êrîş dîtiye hebe, divê em wî/wê jî ligel xwe bibin qereqolê. Li navenda polîsan em dikarin der barê şekilê êrîşkar de agahiyan bidin û lê gilî bikin.

- Dibe ku mû, por û avekiyên bedenî yên êrîşkar li ser me mabin. Di wexta gijgijandinê de, dibe ku çermê êrîşkar ketibin ber neynokên me. Ev gişt delîlên girîng in û dibe ku ji bo girtin û cezakirina kesê êrîşkar pir tesîrdar bin. Piştî êrîşeke zayendî bi şûn de, gelek jin dixwazin di cih de xwe bişon, xwe paqij bikin û ji bin tesîra wê bûyerê derkevin. Lê çi qas zor be jî divê ku em tiştên wekî şûştina dest û serçavan, av têwerdana dev, guhartina kincan nekin, dibe ku ew kirin bibin sedema windabûna delîlan.
- Eger hebin divê em guhdarîkirina li şahidan û berhevkirina delîlên hewce bixwazin.
- Ji bo standina rapora doktor a ku êrîşê belgedar dike, em dikarin ji dozger bixwazin da ku me sewqî Tiba Edlî bike.
- Eger em di rewşeke wisan de bin ku em nikarin tiştekî bikin, divê em biçin saziyeke tenduristiyê ya herî nêz. Li wir em dikarin daxwaza gazîkirina polîsan ji wan bikin.

Der barê gilîkirina sûc de, ji bo agahiyên hîn zêdetir li rûpela 46’an binêrin.

Cezayê tecawizkirina li jinekê, êrîşa zayendî ya li wê yan jî revandina wê, heps e. Eger mêrek jinekê birevîne yan jî tecawizî wê bike, bi zewicandina pê re, ji ceza xelas nabe. Bersûc kî be, eger kes lê nebe gilîkar jî, dev ji gilîkirinê berde jî, dîsan tê darizandin. Cezayê wî qet nayê taloqkirin an jî îptalkirin. Tenê der barê tecawiza li navzewacê de, pêwîstî bi gilîkirina jinan heye.

# TECAWIZA LI NAVZEWACÊ SÛC E

Şeş sal berê Bihar û Mistefa bi dilê xwe bi hev re dizewicin. Çendî zewaca wan baş - xerab dewam bike jî, heyecana Biharê ya ji hevserê wê re çi qas diçe kêmtir dibe. Mistefa berpirsiya mal û zarokan nagire ser xwe. Wekî berê jî guh bi Biharê nake. Car heye bi rojan jê re nabêje tu çawan î. Gava Bihar ji kar westiyayî û jixwedeketî tê malê, dixwaze bi hevserê xwe re rûne, bi hev re mijûl bibin, derdên xwe ji hev re bibêjin. Lê li malê, karên navmalê û zarokê ku li bavê xwe dipirse li bendê ne. Ji aliyê jiyana zayendî ve jî Mistefa guh nade daxwazên Biharê. Eleqepênekirineke wiha dibe sedem ku Bihar ji hevserê xwe sar bibe. Lê Mistefa qet xema dilnexwaziya Biharê naxwe.



Bihar şevekê bi veciniqîn hişyar dibe. Hevserê wê hewl dide ku bi zorê pê re têkeve têkiliya zayendî. Bihar ji xwe re heyirî dimîne. Ji xwe re difikire ka ev kabûs e, çi ye. Dibêje: “Ez naxwazim”, lê ew bi ya xwe dike. Bihar êdî îdare nake, bi şid hevserê xwe wê de dide, ji nav nivînan derdikeve û roniyê pê dixe.

Pê de diqîre û dibêjê: “Tu niha çi dikî, tu yê tecawizî min bikî?” û lê dixe diçe odeya rûniştinê. Hevserê wê dibêje: “Ma ez ne hevserê te me, qey te ji bîr kir?” û tê cem Biharê.

Bihar dibêje: "Wê hem bêyî dilê min be hem jî ez ê razayîbim, tu bi çi heqî bi min re têkiliya cinsî datînî! Ev tiştê ku tu dikî tecawiz e. Te rast bihîst, li nav zewacê tecawiz sûc e. Di televizyonê de, ji fîlmê belgewarî yê bi navê **Rêzeya Mor** ez hîn bûm. Cezayê vê kirina te heps e." Ji Mistefa re behsa pirsgirêkên xwe yên zewaca xwe jî dike û dibêjê ku ev zewac nabe wiha bidome.

Bi şev, qet xew bi çavê Mistefa nakeve. Ji ber şerma sûcê ku hema mabû li dijî hevsera xwe bikira, nerihet dibe. Her wiha tirsiyaye jî... Difikire bê ka dikare çawan xwe bi Biharê bide efûkirin. Tê gihîştiye ku ew jina bi dilê xwe pê re zewiciye, çawan ew neşad kiriye.

Mistefa dest pê dike berpirsiya karên malê û ya zarok dide ser xwe jî, alî Biharê dike û barê li ser milê wê sivik dibe. Ji bo ku zayendîtiyeke bijûndar û şad bijîn, bi hev re biryar didin ku herin cem pisporekî. Bi vê yekê Mistefa hîn dibe ku qîmet bi daxwazên zayendî û hewcedariyên Biharê bide û êdî careke din qet bêyî daxwaza wê pê re têkiliya zayendî danayne. Piştî ku Mistefa eleqe nîşanî Biharê, zarok û mala xwe dide, îhtimam dide daxwaz û pêdiviyên Biharê û parvekirina di navbera wan de jî zêde dibe bi şûn de, dilxwazî û heyecana Biharê ya ji bo Mistefa jî ji nû ve xurt û geş dibe.

- Mafê jinekê heye ku çi çaxa bixwaze û bi awayê ku dixwaze, bihevretiya zayendî bijî.
- Tecawiza li navzewacê sûcekî giran e û sedema berdanê ye. Di dozên berdanê de, dikare wek delîlê miemeleya xerab bê bikaranîn.
- Çawan êrîşa zayendî ya kesê ku em wî nas nakin sûc e, êrîşa zayendî ya kesê ku em wî dinasin jî sûc e. Qanûna Ceza, bêyî daxwaza ji hevseran a yekê, pêkhatina têkiliya zayendî yanê tecawiza li navzewacê wek sûcê êrîşa zayendî ceza dike. Cezayê tecawiza li navzewacê, ji heft salan heta donzdeh salan cezayê hepsê ye (xal 102).

Ji bo gilîkirina tecawiza navzewacê, tenê hewce pê heye ku em li dozgeriyê giliyê sûc bikin. Dozger ji bo ku îfade hilde gazî hevser dike. Eger neyê, emirê girtina wî derdixe. Piştî hildana îfadeya hevser, dozger bi daxwaza girtinê hevser sewqî dadgeha ceza dike. Eger dadger biryara girtina wî nede, li dijî vê biryarê mafê îtirazê yê dozger heye. Tiştê bê kirin ev e ku ji bo dozger îtirazê bike, mirov tê bikoşe.

**Girtina Pêşîn a Ji Ber Tecawiza Hevsera Xwe – Rojnameya Akşamê 25.05.2006**

Li Erziromê mêrikê ku bi zorê têkiliya zayendî bi hevsera xwe re pêk anîbû, bi sedema ku midexaleyî bêrîtiya zayendî kiriye, hate girtin. Zehra U. ya 25 salî ku li gundê Epsemceyê ya Pasînlerê dijiya, demek berê ji ber ku hevserê wê yê 31 salî Ergün U. pêşî lê xistiye û paşê jî pê re ketiye têkiliyê, serî li cendirmeyan dabû û lê gilî kiribû. Ergün U., ku bavê du zarokan e û bi cotkariyê mijûl e, ji ber vê yekê ji aliyê cendirmeyan ve hate binçavkirin. Ergün U. ku qebûl nake wî tecawizî hevsera xwe kiriye, li Dozgeriya Komarê ya Pasînlerê derxistin pêşberî dadger û bi sedema ku "midexaleyî bêrîtiya zayendî kiriye" hate girtin û ew şandin girtîgehê. Ev yek der barê bûyerên tecawizkirina hevseran de, li Tirkiyeyê biryara girtinê ya pêşîn e û ji ber ku ji bo dozên din bibe nimûne jî, pir girîng e.

# EGER EM LÊ WERQILIN KU ZAROKEK DUÇARÎ ÎSTISMARA ZAYENDÎ BÛYE EM Ê BIKARIBIN ÇI BIKIN?

Êrîşa zayendî ne bi tenê li kesên gêran dibe, li zarokan jî dibe. Her cure tevgera zayendî ya ku li zarokan dibe, sûc e. Qanûna Ceza, tacîza zayendî ya ku li zarokan tê kirin, di bin navê **îstismara zayendî ya zarokan** de (xal 103) ceza dike. Her cure tevgera zayendî ya ku li kesên ku wan pazdeh saliya xwe temam nekiriye yan jî li dijî wan zarokan tên kirin ku qabîliyeta fehmkirinê ya reftarên zayendî û encama wan bi pêş neketiye, sûc e. Cezayê vî sûcî jî, ji 3 salan heta 8 salan heps e. Ji bo kesên gêran têgiha **êrîşa zayendî** û ji bo zarokan jî îstismara zayendî tê bikaranîn. Ji ber ku der barê reftarên zayendî de, yên li dijî kesên ku temenê wan di biniya 15 salan re ye, “rizaya wan” nabe dabaşa mijarê. Dibe ku zarok ji aliyê kesên gêran ve bên xapandin, xirandin û xelitandin. Loma jî eger zarok bibêje min jî xwest, dîsan ji aliyê hiqûqî ve tu mehneyeke wê nîn e. Kesê îstismarker ji cezaxwarinê xelas nabe.

Berevajiyê qenaeta berbelav, piraniya bûyerên îstismara zayendî yên li dijî zarokan, di nav malbatê de diqewimin. Ango kesên ku îstismarê dikin, bi awayekî giştî endamên malbatê yên wekî dê, bav, xwişk, bira, ap, xal û bapîr in. Eger em lê werqilin ku li zarokekî tacîz tê kirin, divê bi awayekî qethî em wê veneşêrin, li kesê sûcdar gilî bikin û bikin ku zarok hildin bin mihafezayê.

Sedemên Ku Sûcê Îstismara Zayendî ya Zarokan Giran Dikin:

- Têxistina organ an jî cismekî ya li bedena zarokê
- Zorlêkirin an jî gefxwarina li zarokê/a ku 15 saliya xwe temam nekiriye
- Zerardayîna li bijûndariya beden û giyanî ya zarok/ê
- Ji aliyê ferdên malbatê, erkedarên qanûnî, kesên lênêr, perwerdekar, kardar an jî erkedarên bijûndariyê ve pêkhatina sûcê.

Hemû reftarên zayendî ku bi zorê li ciwanekî yê di navbera temenê 15 û 18’an de hatine kirin, sûc in û ji 3 salan heta 8 salan bi cezayê hepsê tên cezakirin.

Ciwanên ku temenê wan di navbera 15 û 18’an de ye, bêyî zorlêkirinê, eger bi dilê xwe têkiliya cinsî pêk bînin, ne sûc e. Pir girîng e ku bi ciwanan re der heqê mijarên zayendîtiyê de bê axaftin û ew li ser nexweşînên ku bi riya têkiliya zayendî di mirovan digerin û der barê rêbazên kontrola welidandinê de bên agahdarkirin.

## Em çawan dikarin fehm bikin ku zarokek duçarî îstismara zayendî bûye?

Dibe ku her tim tesîrên îstismara zayendî bi awayê xwînîbûn, qusek û morahiyên li ser wicûdê xuya nebin. Divê em bala xwe bidin ser guherînên peyvên ku zarok wan bi kar tînin û şêl û tevgerên wan. Dibe ku zarokên îstismara zayendî li wan bûye, bertekên cuda nîşan bidin. Wek mînak, lîstik, reftar gotinên ku zayendîtiya zêde li xwe digirin, an jî bi tevahî redkirina hemû tiştên bi zayendîtiyê

ve eleqedar, reftarên ku ziyanê digihînên xwe, xwarina zêde yan jî nexwarin, nexweşketina timî (bi taybetî nerihetiyên ku sedemên wan nayên tesbîtkirin), depresyon, xwegirtîbûn, dûrsekinîna ji derdora xwe, xewherimîtî, fikirîna xwekuştinê yan jî teşebûskirina xwekuştinê û yên din, dibe ku bertekên zarok ên ji ber îstismarê bin.

Eger em ji vê yekê ne bawer bin, divê em hewl bidin ku bi zarok re biaxivin û jê bipirsin bê ka kesên derdorê çawan pê re didin û distînin. Eger em têra xwe ji zarok re ne nêz bin, em dikarin ji kesekî ku zarok pê bawer û ewle dibe, alîkarî bixwazin da ku jê bipirse. Em dikarin serî li navendên zarokan ên nexweşxaneyan bixin û zarok nîşanî pisporê xizmetên civakî yan jî psîkologekî/ê bidin.


# ÎSTISMARA ZAYENDÎ YA ZAROKAN

Zerîn zarokeke 11 salî ye ku ji dersên xwe re jî têra xwe jêhatî ye û bi hevalên xwe re jî xweş dibihêre. Zerîn ku bi piranî ew yeka bixeberdan, şên û beşerxweş e, lê di nav çend hefteyên dawî de şêl û rewşa wê zehf diguhere. Zêde bêdeng û mit dibe. Xew jî lê herimiye. Zerîn çi qas diçe pixudî û xwegirtî dibe û ditirse ku li malê bi tena serê xwe bimîne.




Li dibistanê wekî berê hişê xwe nade dersan. Di wexta bêhnvedanê de jî, li şûna ku bi hevalên xwe re bileyîze, tenê li goşeyekî rûdine. Hema bibêje tu tiştek wê dilşad nake. Gava weliyên xwendekaran an jî mamosteyên din tên fêrgeha wan, dilnerihetiya wê zêde dibe. Zerîn tim unîformaya xwe ya dibistanê kaş dike û pê mil û çîmên xwe digire. Mamosteya fêrgehê li rewşa wê werdiqile.

Rojekê mamosteya wê ku dibîne Zerîn ji her carê zêdetir biqilqal e, piştî navbera dersê ji bo ku pê re bipeyive diçe balê. Jê dipirse: “Zerîncan çi yê te heye, ji bo ezmûna sibehê tu wisan diqilqilî qey?” Zerîn dibêjê ku ji bo ezmûnê dê êvarê li malê bixebite. Lê gava behsa malê dike, çavên wê tije dibin. Dibêje ku “Dê ew were, apê min îşev tê mala me.” û dest bi girînê dike. Gava mamoste dixwaze fehm bike bê çima Zerîn ji apê xwe ditirse, lê ew xwe ranagire û dibêjê ku apê wê tiştên ku ew naxwaze û bi awayekî ne normal pê dike.



Mamosteya wê hewl dide ku Zerînê hinekî dilrihet bike û jê re dibêje ku divê êdî netirse, kes nikare tiştê bêyî dilê wê pê bide kirin. Piştre jî dê û bavê wê vedixwîne dibistanê. Mamoste ji dê û bavê Zerînê re dibêje ku ew ji aliyê apê xwe ve duçarî îstismara zayendî bûye. Dê û bav pêşî bawerî bi gotina mamoste naynin. Lê tê hişê wan ku gava apê Zerînê tê mala wan, çawan ew bêhizûr dibe û naxwaze bi tena serê xwe here metbexê jî. Dê û bavê Zerînê hewl didin ku hêrs û xemgîniya xwe deynin aliyekî û jê re dibêjin ku ew jê pir hez dikin, xeman mexwe û ew dê wê biparêzin.

Malbat serî li dozger dide, gilî dikin û apê wê didin girtin. Ji bo Zerîn ji aliyê psîkolojîk ve rihet bibe, diçin cem psîkologekî/ê. Psîkolog ji dê û bav re, ji ber ew zû bi rewşê nehisiyane û xwe sûcdar dibînin, dibêje ku îstismara zayendî ya di nav malbatê de pir heye û gelek caran rastî vê yekê tên. Dibêje wan: “Hewce ye mirov hay ji şêl û tevgerên zarokan hebe û bawerî bi gotinên wan bîne.” Zerîn û malbata wê berdewamî bi standina desteka psîkolojîk dikin. Bi piştgiriya malbata xwe Zerîn bere bere tê ser hemdê xwe yê berê û careke din dibe yeka şên û bixwebawer.

Divê em rêz li mafên bedenî yên zarokan bigirin. Hewce ye em ji wan re bibêjin ku bedena wan aîdî wan e. Divê em bi wan bidin fehmkirin ku tu kes bêyî dilê wan nikare têkilî wan bibe. Pêwîst e em kesên ku wan nerihet dikin, ji wan bi dûr bixin, wan hînî gotina “Na” bikin û nehêlin tiştên ku hatine serê wan, wekî razekê veşêrin. Her wisan divê em ji wan re vebêjin ku ew dikarin ji me alîkariyê bixwazin û em ê ji wan bawer bikin.

**Eger em lê werqilîn ku zarokek duçarî îstismara zayendî bûye, em ê bikaribin çi bikin?**

Berî her tiştî divê ewledariya fizîkî ya zarok bê dabînkirin. Wekî din, hewce ye mirov desteka hestî bidê û jê re bibêje ku em jê bawer dikin û em ê wê/wî bihêvişînin û biparêzin. Em dikarin serî li navendên zarokan bidin ku ew li gelek nexweşxaneyên zanîngehan hene û ew alîkariya tibî, psîkolojîk û hiqûqî didin.

- Eger navendeke zarokan a ku em ê serî lê bixin tune be, ji bo ku em jê bawer bin ku tenduristiya fizîkî ya zarok li cih e, em dikarin zarok bibin nexweşxaneyekê. Li nexweşxaneyê der barê mijarên wekî nexweşînên ku bi riya zayendî di mirov digerin û di heqê ducanîbûnê de, destek tên dayîn.

- Saziyên bijûndarî, perwerde û emniyetê gava bizanin ku zarok duçarî îstismara zayendî bûye, divê tafilê Dozgeriya Komarê bi rewşê bihisînin.
- Ji bo tesbîta nexweşînan û ji bo tesbîtkirina nîşanên sûcê, dibe ku mieyena zarok bê kirin. Bêyî pesenda zarok, welî, wasî, dadger an jî ya dozger, mieyene nayê kirin.
- Hewce ye ku zarok û malbat desteka psîkolojîk wergirin. Ji bo vê yekê jî em dikarin serî li beşa psîkolojiyê yan jî ya bijûndariya zarokan bidin.

Ji bo hêvişandina zarok û şopîna sûcê:

- Tenê hewce dike mirov li Mudiriya Bajêr a Wezîriya Malbat û Polîtîkayên Civakî îxbarê bike, li dozgeriyê yan jî li cem hêzên ewlekariyê giliyê sûc bike. Zarok bi xwe, welî yan jî wasiyê zarokê rasterast dikarin serî li dadgehê bidin û dozê vekin.
- Li navenda polîsan an jî li dozgeriyê, ji bo zarok ji baroyê parêzerek tê tayînkirin. Gava wek şahid li zarok were guhdarîkirin, divê erkedarekî ku di warê psîkiyatrî, tib an jî di warê perwerdehiyê de pispor e, hebe û divê ku qeyda deng û dîmen jî bê kirin.
- Eger cihê ku zarok lê dijî ne ewledar be, biryara hêvişandinê ya acîl tê derxistin û zarok li saziyeke xizmetên civakî tê bicihkirin. Li dadgehê dadger li ser derfetên xwedîkirin û hewînê ya zarokê biryarê dide.

# TACÎZA ZAYENDÎ Û LI CIHÊ KAR TACÎZA ZAYENDÎ

Tacîza zayendî sûcekî wisan e ku em di jiyana xwe ya rojane de gelek caran lê rast tên. Wekî gotinên xwedî naveroka zayendî, helwest, di ber re avêtina gotinan û lênêrînên isrardar hemû tevgerên tacîza zayendî ne ku ji aliyê zayendî ve me aciz dikin. Di tacîza zayendî de, destdana wicûdê nîn e. Gava bi mebesta zayendî dest biavêjin bedena mirov, sûcê êrîşa zayendî pêk tê û cezayê vê jî gelekî giran e. Zêdebûna tacîza zayendî dike ku em nikarin bi rihetî derkevin kuçeyê, bixebitin û ji wesayîtên veguhastina komelî sûd wergirin. Tacîza zayendî ya ku li malê, li kar, li kuçeyê li me dibe û ew fikareya ku em ê duçarî tacîzê bibin, dibe sedem ku em beden û zayendîtiya xwe veşêrin.



Qanûna Ceza sûcê tacîzê, li ser giliyê kesê/a ku duçarî tacîzê bûye ceza dike (xal 105). Li kesê ku vî sûcî kiriye, ji sê mehan heta bi du salan cezayê hepsê yan jî cezayê pere yê edlî tê birîn.

## Tacîza zayendî ya li cihê kar, sûcekî wisan e ku cezayê vî sûcî hatiye girankirin.

Dilşah deh sal e ku li şirketeke taybet dixebite. Hevalê wê yê kar Mihemed ku li heman şirketê dixebite, demek berê hatibû terfîkirin û bûbû serkarê Dilşahê. Mihemed rojekê ji Dilşahê re diyar dike ku ji aliyê hisî ve dilê wî pê ve ye û teklîfa hevaltiyê lê dike. Lê Dilşah gelek caran jê re dibêje ku dilê wê ne di wî de ye û teklîfa wî qebûl nake. Digel vê yekê Mihemed bi tevgerên xwe, bi axaftin û lênêrîna xwe, israra xwe didomîne.

Li şirketê gava di ber Dilşahê re derbas dibe, bi awirên xwe wê aciz dike, axînê radihêje û dixwaze destê xwe pê bike, têkilî wê bibe. Mesajên ku dilê Dilşahê nerihet dikin û wê diqilqilînin, dişîne ser telefona wê. Dilşah ji ber ku naxwaze ji karê xwe bibe û li dijî tacîzan li ber xwe dide, êdî naqedîne û serî li mudirê xwe dide. Jê re dibêje ku Mihemed wê tacîz dike û naxwaze pê re bixebite.

Mudir guh nade gilî û gazinên Dilşahê û jê re dibêje ku ew ji bal xwe ve van fikiran çêdike û li ser kêfa kesî jî nikare miemeleyan bike. Bi gotinên: “Tiştên wiha dibe çêbin, ma tu dixwazî ji karê xwe bibî”, hewl dide ku Dilşah dev ji gilîkirinê berde.

Li ser vê yekê, Dilşah biryar dide ku serî li Dozgeriya Komarê bide. Li dozgeriyê vê rewşê ji erkedaran re vedibêje. Mesajên ku hatine telefona wê, nîşanî wan dide û bi daxwaznameyê giliyê sûc dike. Dozgerî ku mesajên di telefonê de wek delîl qebûl dike, ji bo ku îfadeyên Mihemed bistîne, gazî wî li dozgeriyê dike.

Ji ber ku Mihemed bersiv nade vê bangê, der barê wî de biryara girtinê tê derxistin. Polîs tên şirketê û li ber çavên mudir û hevalên wî yên kar Mihemed hildidin dibin dozgeriyê. Digel gilîkirina Dilşahê, ew mudirê ku wî ji bo berastengkirina tacîzê tu tiştek nekiriye, dawî li karê Mihemed tîne. Li ser vê biryara mudir, tesîra gotin û helwesta Dilşahê heye ku wê jê re gotibû ku eger ew Mihemed ji kar dernexe dê dev ji kar berde, tezmînata xwe bistîne û der barê wî de jî ji ber hêvişandina sûc û sûcdar dozê veke. Piştî vê rewşê bêhna Dilşah û xebatkarên din dertê û rihet dibin. Ji lew re hemû kesên li şirketê pê hisiyane ku tacîza cînsî ya li kar sûc e û ji aliyê qanûnan ve jî tê cezakirin.

Ew kesê ku li cihê kar tacîza zayendî dike, dibe ku kardar, amîr, hevalê kar an jî xebatkarek be. Ev kes, ji têkiliyên cihê kar ên raser û rajêriyê û ji ber rihetiya ku her roj bi hev re li cihekî ne îstifade dikin. Her wisan, ji ber tirsa ku dê ji karê xwe bibe jî, dibe ku kesa duçarî tacîzê were, jê re zehmet be ku şikayeta tacîzê bike.

Ji ber vê yekê, Qanûna Ceza tacîza zayendî ya ku li cihê kar dibe, bi qasî nîvî vî cezayî zêde dike (xal 105). Eger ew kesa ku duçarî tacîza zayendî bûye, ji ber vê rewşê ji karê xwe îstifa kiribe, nabe ku cezayê hepsê yê li tacîzkar bê birîn, ji salekê kêmtir be.

# "KUŞTINA JI BER NAMÛSÊ"

Ji ber ku mirov bi qanûnên kevneşopî û yên gotinkî yên civakê mezin dibin, jin jî ji ber vê yeka hanê hîn dibin ku bi tirsa "namûsê" jiyana xwe bidomînin. Wek nimûne, li gorî lêkolîna me ya ku me di sala 1998'an de li Rojhilatê Anatoliyê û Başûrê Rojhilatê Anatoliyê kiribû, piraniya jinên zewicandî difikirin ku eger ew têkiliyeke zayendî ya derî zewacê pêk bînin, wê ji aliyê hevserê xwe ve bên kuştin û vê rewşê jî wekî tiştekî asayî û sirûştî dibînin.*

Li gorî lêkolîna Fona Nifûsê ya Neteweyên Yekbûyî, ku di sala 2005'an de hatibû kirin, piraniya jinên zewicandî, difikirin ku eger ew bi mêrekî din re pevrebûna zayendî pêk bînin, kuştinê heq dikin.** Lê belê, sedem çi dibe bila bibe, tu jinek kuştinê heq nake. Jixwe ne sûc e ku jinek bi kesê ku pê re nezewicandî ye, pevrebûna zayendî pêk bîne. Di Qanûna Ceza de sûcê bi navê "zîna"yê tune ye. Ji hevseran yek gava bi yekî/e din re rakeve, tenê dibe ku ew wekî sedema berdanê bê hesibandin.

## Namûsa kuştinê tune ye

Beşeke girîng a binpêkirina mafên mirovan ên jinan, bi behaneya "namûsê" tê kirin. Êrîşên ku bi navê "namûsê" pêk tên, ango sûcên ji ber namûsê, azadiya liv û tevgerîna jinan kêm dike. Bi behaneya ku "dê namûs ji dest biçe", rê li ber çûna jinan a dibistanê, xebat û beşdariya wan a li jiyana civakî tê girtin û astengkirin.

Lê tu têkiliya têgiha "namûsê" bi jinê re, bi bedena wê re yan jî bi zayendîtiya wê re nîn e. Jin dibe mêr dibe, eger li gorî qaydeyên jiyana li nav civatê li gorî tev bigere, derewan neke, xapxapokiyê neke, xelkê nexapîne, mafên kesên din binpê neke, ew dibe binamûs. Li civakên pederşahî yên wekî Tirkiyeyê, têgiha "namûsê" ji bo ku jinan di bin pêkutî û çewisandinê de bihêlin, wekî navgînekê tê bikaranîn.

## Der barê kuştinên ji ber namûsê de, daxistina ceza nayê kirin

Sûcên herî giran ên ku li dijî jinan tên kirin, "kuştinên ji ber namûsê" ne, ku ew mafê jiyanê yê jinan ji destê wan distîne. Kuştinên ji ber namûsê, pirî caran ji aliyê hevserê jinikê, malbata wê, lêzimên wê yan ji aliyê yarê/xweşdiviyê wê ve yan jî bi biryara meclîsa malbatê tên kirin. Zor li jinan tê kirin ku ji ber namûsê xwe bikujin. Ev întihar jî cureyek kuştinên ji ber namûsê ye.

Sûcê kuştina mirovan bi cezayê hepsê yê sermedî, lê kuştinên ku bi navê namûsê tên kirin bi cezayê hepsê yê sermedî yê giran tên cezakirin (Qanûna Ceza ya Tirk, xal 81, 82). Qanûna Ceza di warê kuştinên ji ber namûsê de, daxistina ceza pir bi sînor kiriye (tehrîka neheq, xal 29, Sedem).

Tirkiye roleke mezin girtiye ser xwe da ku "sûcên namûsê" ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve wek cureyekî tundiya li ser jinan qebûl bike. Her welatê endamê Neteweyên Yekbûyî, mecbûr e ku her cure tedbîrên qanûnî û hêvişîner bistîne da ku sûcên namûsê ji holê rabin.

---

* Pınar İlkkaracan "Doğu Anadolu'da Kadın ve Aile" (Jin u Malbat li Rojhilata Anatoliye), Bilanço 98: 75 Yılda Kadınlar ve Erkekler; Tarih Vakfı Yayınları; Stenbol, 1998.

** Rapora bi navê "Türkiye'de Namus Dinamikleri" (Dînamîkên Namûsê Li Tirkiyeyê) ku Fona Nifûsê ya Neteveyên Yekbûyî, Programa Bipêşketinê ya Neteveyên Yekbûyî û Komeleya Demografiyê di sala 2005'an de amade kiriye.

**Ji bo Qatilê Güldünya Tören Hepsa Sermedî - CNN TURK / 14 Cotmeh 2005**

Her du birayên ku wan ji ber sedema derî zewacê zarok jê re çêbûye Güldünya Tören kuştiye û bi girtîtî tên darizandin, li yekî cezayê sermedî û li yê din jî cezayê hepsê yê 11 sal û 8 mehan hate birîn.

Heyeta Dadgehê ku li danişîna Dadgeha Cezayê Giran a 5'an a Bakırköyê biryara xwe aşkera kir, cezayê hepsê yê sermedî da bersûc İrfan Tören. Dadgehê, ji ber ku di dema bûyerê de temenê E.T. ji 18 salan kêmtir bûye, ew bi 11 sal û 8 mehan ceza kir.

**Qewimîna bûyerê**

Güldünya Tören, ku tê gotin derî zewacê bihemle maye û zarokek aniye dinyayê, pêşî bi sîlehê hatibû birîndarkirin, piştre jî li nexweşxaneya ku lê tedawî dibû, di 25 Sibat 2004'an de ji aliyê birayên xwe ve hatibû kuştin.

**Cezayê Sermedî Dan Kekê Meryemê Ku Wî Ew Bi Sedema "Namûsê" Kuştibû - Navenda Nûçeyan a BIA'yê/ 03. 10. 2006 Murat GÜREŞ**

Dadgeha Cezayê Giran a 2'yan a Entebê, ji ber ku Selahattin Sezgen xwişka xwe ya 16 salî ya ku hemla wê şeş mehî bû, bi sedema namûsê kuştibû, bi sûcê ku wî "bi saîqa toreyê bi qestî xwişka xwe kuştiye", cezayê hepsê yê sermedî lê birî.

Selahattin Sezgen (22) li Entebê, ji ber kuştina xweha xwe ya 16 salî Meryem Sezgen bi sedema namûsê kuştiye, di encama darizandinê de, bi cezayê sermedî  hat cezakirin. Parêzer di parêziya xwe de îdia kir ku kuştin bi sedema toreyê nehatiye kirin.

Selahattin Sezgen, ku ew bi girtîtî dihat darizandin û parêzerê wî Ziya Fırat tevî danişîna dozê ya li Dadgeha Cezayê Giran a 2'yan bûn. Parêzer Ziya Fırat parêziya xwe bi nivîskî da heyeta dadgehê û derpêş kir ku miwekîlê wî bi hinceta toreyê ev cinayet nekiriye û got:"Ji ber ku wê heqaret li kekê xwe kiriye, pevçûn di navbera wan de qewimiye û di encamê de ev kuştin çêbûye. Bûyer ne kuştineke toreyî ye." Selahattin Sezgen jî, li ser pirsa gotina wî ya dawî, got ku ew tevî parastina parêzerê xwe dibe û ji ber toreyî wî ev cinayet nekiriye û teqdîrê ji dadgehê re dihêle.

Heyeta dadgehê piştî navbereke kurt, biryar da ku Selahattin Sezgen "bi saîqa toreyê bi qestî xwişka xwe kuştiye" û ji ber vî sûcî jî cezayê hepsê yê sermedî lê birî.

**Hemla Meryemê 6 mehî bû**

Li Entebê, li Taxa Ocaklarê ya navçeya Şahînbegê di 5'ê Tîrmehê de, Selahattin Sezgen, ji ber ku li derî têkiliya zewacê xwişka wî Meryem a 16 salî ducanî bûye, bi sedema ku "li dijî adetan tev geriyaye" kuştibû. Di encama otopsiyê de derketibû holê ku hemla keçika ciwan 6 mehî bûye (MG/KÖ).

# MAFÊ JINAN Ê KURTAJBÛNÊ HEYE

Biryardana ku dê kengê û çend zarokan bîne, mafê her jinekê yê zayekî ye. Ji bo ku em zayekiya xwe bikaribin kontrol bikin, em dikarin rêbazên cuda yên kontrola welidînê bi kar bînin. Eger bêyî dilê xwe em ducanî mabin, ji bo ku em dawî li ducanîbûnê bînin, mafê me heye ku em kurtaj bibin. Kurtaj ne rêbaza kontrola zarokneanînê ye, emeliyat e. Divê ew li saziyeke bijûndariyê ya bitechîzat, ji aliyê wezîfedarên bijûndariyê yên pispor ve bê kirin.

Li gorî qanûnan, ji bo rewşa ducanîtiyê heta 10 hefteyan kurtaj serbest e. Eger ducanîtî tenduristiya jinan bixe xetereyê, piştî deh hefteyan jî kurtaj tê kirin. Ew jinên ku ji ber duçarmana êrîşa zayendî ducanî bûne, eger bixwazin dikarin heta bîst hefteyên pêşîn ên ducanîtiya xwe jî kurtaj bibin.

Lê xala Qanûna Ceza ya Jiberçûna Zarokan, ew jina ku piştî deh hefteyan ji ber ducanîtiya xwe kurtaj bibe, lê cezayê hepsê yan jî cezayê pere yê edlî tê birîn (xal 100). Lê belê dibe ku her jin di deh hefteyên pêşiyê de bi bihemlebûna xwe nehisin. Ji bo ku jin serî li rêbazên neewledar ên jiberxwekirina zarokan nedin û rê li ber wan bê girtin, divê dema kurtajê ya qanûnî derkeve 12 hefteyan. Wekî rêxistinên bijûndariyê yên navneteweyî jî îşaret pê didin, ew kurtaja ku di nav 12 hefteyên pêşîn de, li saziyên bijûndariyê yên xwedî derfetên tam û têkûz tên kirin, tenduristiya jinan naxe talûkeyê.

Bêyî rizaya jinan, jiberkirina zarokan sûc e û ji pênc salan heta deh salan bi cezayê hepsê tê cezakirin (Qanûna Ceza, xal 99). Di rewşên acîl de, wekî talûkeya jiyanî, doktor bêyî destûra jinekê, dibe ku mecbûr bimîne midaxale lê bike. Îhlalkirina mafê kurtajbûnê ya bi awayê ewledar a jinan, sûc e. Bi dilê jinan be jî, eger ew kesê ku kurtajê dike ne erkedarê bijûndariyê yê rayedar be, ji ber ku tenduristiya jinan dixe talûkeyê, ji du salan heta çar salan bi cezayê girtîgehê tê cezakirin.

Der barê kurtajê de agahiyên din:

- Li gorî peymanên navneteweyî yên ku Tirkiyeyê ew îmze kirine û ji aliyê hiqûqî ve jî ew di ser qanûnên neteweyî re ne, ji bo ku jinek kurtaj bibe hewcehiya wê bi pesendkirina hevserê wê yan jî bi ya yekî din tune ye. Lê hinek doktor xwe dispêrin Qanûna Der Barê Plankirina Nifûsê De û ji bo ku jinên zewicandî kurtaj bikin ji wan pesendkirina hevserê wan dixwazin. Eger em rastî rewşeke wiha bên, em dikarin herin cem doktorekî din. An jî em dikarin ji doktor re bibêjin ku ev qanûna ku di sala 1983'yan de ketiye meriyetê, qanûneke kevn e. Em dikarin bi bîra doktor bixin ku li gorî Qanûna Ceza ya di sala 2005'an de hatiye pejirandin, kurtajbûna bi qebûla jinan a di hemlebûna 10 hefteyên pêşîn de, ne sûc e.
- Eger em nikaribin doktorekî/e din peyde bikin û li ser kurtajbûnê jî em bi hevserê xwe re li hev nekin, em dikarin serî li Dadgeha Malbatê bidin û ji dadger bixwazin ku midaxaleyî lihevnekirinê bike (Qanûna Medenî, xal 195).
- Eger bêyî daxwaza me kesekî din hewl bide ku zaroka me ji ber me biçe, em dikarin ji polîs û cendirmeyan daxwaza hêvişînê bikin.
- Di sala 2012'an de, em bi talûkeya ku mafê kurtajbûnê ji me bê standin re, rû bi rû man. Maweya kurtajbûnê hat rojevê ku ew dakeve biniya 10 hefteyan û der barê vê yekê de jî hin kirinên fiîlî pêk hatin. Ji bo ku mafê me yê bidestketî ji me neyê standin, divê ku em gişt hişyar û baldar bin.

# KONTROLA BEKARETÊ SÛC E



Kontrola bekaretê, venêrîna zayendîtiya jinan û keçên ciwan e ku ev jî îhlalkirineke zêde giran a mafên mirovan e. Li Tirkiyeyê têgiha bekaretê û kontrola bekaretê dibe sedema kuştina keçên ciwan û jinan, dibe sedema xwekujiya wan û duçarbûna wan a tund û tûjiyê. Lê mafê her jinekê heye ku ew bi kê re û çi çaxê bixwaze, têkiliya zayendî pêk bîne.

Li gorî Rêziknameya Dîsiplînê ya Saziyên Perwerdehiyê yên Lîseyê ya berê ya Wezareta Perwerdehiya Neteweyî, “bêîfetî” ji bo avêtina ji dibistanê sedemek bû. Mudirên dibistanan ji bo îsbata “bêîfetiyê”, dikaribû xwendekarên keç bişandina testa bekaretê. Di encama pest û berteka tevgera jinan de, peyva “bêîfetî”yê ji rêziknameyê hat derxistin û dev ji vê sepanê hat berdan.

Bi heman awayî, bi xala 287’an a Qanûna Ceza jî, ji bo kesên ku jinan dişînin kontrola bekaretê û yên ku wan mieyene dikin, ji 3 mehan heta salekê cezayê hepsê tê xwestin.

## Mieyeneya genîtal

Ji bo lêpirsîna sûcekî zayendî dibe ku dozger an jî dadger ji me bixwaze ku em mieyeneya genîtal bibin. Lê eger em vê yekê nexwazin, em dikarin bi dozger zebta redkirina mieyeneyê bidin girtin. Bêyî pesenda me dozger nikare me bişîne mieyeneyê. Ew ê bêyî delîlên ku ji mieyeneyê bi dest bixe, dozê bidomîne. Der barê doktorê/a ku bêyî rizaya jinekê mieyeneya genîtal kiriye, mirov dikare li odeya tabîban, gilî lê bike.

Qanûna Ceza, ew kesên ku bêyî biryara dozger û dadgerê rayedar jinekê dişînin mieyeneya genîtal û doktorên ku vê mieyeneyê dikin, ji 3 mehan heta salekê bi cezayê hepsê ceza dike (xal 287).

Eger ji bilî rizaya me bê xwestin ku mieyeneya genîtal bê kirin, em dikarin çi bikin?

- Erkedarên bijûndariyê dizanin ku bêyî biryara dozger û dadgerê rayedar, kirina mieyeneya genîtal sûc e. Eger nizanibin, em dikarin ji wan kesan re, yên ku hewl didin mieyeneya genîtal bikin, bibêjin ku em ê der barê wan de li dozgeriyê giliyê sûc bikin û doza ceza li wan vekin.
- Em dikarin ji erkedarê bijûndariyê bixwazin ku li polîs û cendirmeyan bigerin. Em dikarin li dijî kesên ku em anînê mieyeneyê, ji hêzên ewlekariyê daxwaza parastinê bikin.

# GILÎKIRINA SÛC

Ji bo şopandina êrîşa zayendî yan jî sûcê tacîzê û girtina êrîşkar, hewce bi gilîkirina sûc heye. Ji bo vê jî pêwîst e mirov here cem hêzên zebtiyeyê (polîs an jî cendirme) îfade bide û gilî bike. Eger ew hêza zebtiyeyê ji herêma ku êrîş lê pêk hatiye ne berpirs be, wê berê me bide qereqola rayedar.

**Dayîna îfadeyan:** Bi qasî ku tê bîra me, bi kitekit vegotina bûyera ku hatiye serê me, vegotina li ser êrîşkar û cihê êrîşê yan jî tacîzê û wexta wê ye. Dema em îfadeyên xwe didin, eger hebe divê em şahidên bûyerê û delîlên xwe jî bibêjin.

- Ji bo gilîkirinê, nasnameyek (cuzdanê nifûsê yan jî yê zewacê, pasaport an jî ehliyet) bes e. Eger li cem me tune be, paşê jî em dikarin belgeyekê bidine wan.
- Em dikarin li polîsxaneyê parêzer bixwazin. Gava ku ji baroyê parêzer bê xwestin, hewce nake ku ji keya daxwaza belgeya xizaniyê yan jî ya rûniştgehê bê kirin. Ev belge, ji bo dozên hiqûqî wexta li buroya alîkariya edlî serlêdan tê kirin, tên xwestin. Bi gotineke din, gava em li qereqolê bin, mafê me heye em parêzer bixwazin û vê daxwazê ragihînin baroyê. Ji bo vê yekê jî pêwîstî bi tu belgeyî nîn e. Gava doza ceza were vekirin jî em dikarin ji baroyê bixwazin da ku parêzerek tayîn bikin. Ev mafekî bingehîn e.

## Li Polîsxane û Dozgeriya Komarê Divê Em Baldarî Çi Bin?

- Ji bo ku em bi awayekî tam bi nivîsandina tiştên ku me gotine ewle bibin, divê beriya îmzekirina îfadeyên xwe, em wan bixwînin an jî bidin xwendin.
- Divê di girtenameyê de numareya qeyda sûc, dem û 3 îmze hebin. Ev îmzeya me, îmzeya polîsê ku îfadeya me hildaye û îmzeya amirê polîsxaneyê ne.
- Divê em teqez kopyayeke girtenameyê hildin ku li serê nivîsa “wekî eslê wê ye”, heye. Hêzên zebtiyeyê girteya îfadeyan radigihîne Dozgeriya Komarê.
- Em jî dikarin herin Dozgeriya Komarê. Di her saetê de dozgerekî nobedar wezîfe dike. Em dikarin kopyayeke girteyê û daxwaznameya gilîkirinê ya li ser êrîş an jî tacîza ku em duçarî wê bûne, bidinê û giliyê sûc bikin.
- Divê teqez em “numareya hazirkirina dosyayê” ya gilîkirina sûc ji wan bistînin. Em dikarin bi vê numareyê û bi numareya qeydê ya sûc a di zeptê de, şikayeta xwe taqîb bikin.
- Bi mebesta ku der barê tecawizê de delîlan bi dest bixin, dibe ku dozger bixwaze me ji bo mieyenê bişîne tabîbê edlî. Eger em pesend bikin, encama mieyeneya ku hatiye kirin, tenê ew dişînin cem dozger.
- Dozgerî ji bo girtina êrîşkar, fermana lêgerînê derdixe û dozê vedike. Gava bersûc tê girtin, ji bo teşxîsa wî dibe ku gazî me û qereqolê bikin. Di dema teşxîsê de, ji bo ku bersûc me nebîne, tedbîr tên standin. Wexta ku dadgeh dest pê dike, ji bo ku em îfade bidin, dê teblîxatek bê navnîşana me.

## GIRTEYA ÎFADEYAN A KESA/Ê GILÎKAR/MEXDÛR

Cihê ku Îfade Lê Hatiye Girtin:.......................................................................................
Tarîxa Standina Îfadeyan:.............................................................................................
Nasnameya Mexdûr: .....................................................................................................
Numareya Nasnameyê ya KT'ê:.......................................................................................
Nav û Paşnav:...............................................................................................................
Navê Dê û Bav: .............................................................................................................
Cihê Jidayikbûnê:..........................................................................................................
Bajarê/Bajaroka Ku Lê Qeydî Nifûsê Bûye: .......................................................................
Navnîşana Rûniştgehê û Telefon:......................................................................................

Navnîşana Cihê Kar û Telefon:.........................................................................................
Numareya Faksê, Telefona Destan:...................................................................................
Navnîşana Nameya Elektronîk: ........................................................................................
Rewşa Perwerdehiyê: ....................................................................................................
Pîşe û Rewşa Aborî:.......................................................................................................
Rewşa Zewacê, Hejmara Zarokan:.....................................................................................

Bi bîra mexdûr/gilîkar hat xistin û aşkerakirin ku maf heye ew daxwaza berhevkirina delîlan bike, bi şertê ku veşarîbûna lêpirsînê û mebesta wê têk nebe, dikare ji Dozgeriya Komarê nimûneya belgeyan bixwaze, eger parêzerê wê/wî tune be, ji bo ku ji alîkariya parêzerekî sûd wergire, dikare daxwaz bike ku yek ji aliyê baroyê ve jê re bê wezîfedarkirin, bi şertê ku li gorî xala 153'yan a Qanûna Usûla Muhakemeyên Ceza (QMC) be, bi navgîna wekîl dikare belgeyên lêpirsînê, tiştên ku hatine desteserkirin û hatine parastin bide vekolandin, li gorî usûla di qanûn de nivîsandî ye, dikare li dijî biryara Dozgerê Komarê ya ku hewceyî bi taqîbatê nîn e, îtiraz bike.

Piştî bicihanîna xisûsên ku di xala 234'an a Qanûna Muhakemeyên Ceza de nivîsandî ne, ev girteya hildana îfadeyan hate xwendin û ji aliyê gilîkar û kesên din ên amade ve jî hate îmzekirin.

| KESÊ ÎFADE STENDIYE | KESÊ ÎFADE NIVÎSANDIYE | KESÊ ÎFADE DAYE | PARÊZER |
| --- | --- | --- | --- |
| Polîs | Polîs | Gilîkar | Daxwaz nekir |

2007/1500

**MÜŞTEKİ/MAĞDUR İFADE TUTANAĞI**

| | | |
|---|---|---|
| İfadenin Alındığı Yer | : | |
| İfadenin Alındığı Tarih | : | |
| Mağdurun Kimliği | : | |
| T.C. Kimlik Numarası | : | |
| Adı Soyadı | : | |
| Baba ve Anne Adı | : | |
| Doğum yeri | : | |
| Nüfusa Kayıtlı Olduğu İl – İlçe | : | |
| İkametgâh Adresi ve Telefonu | : | |
| İş Yeri Adresi, Tlf | : | |
| Faks Numarası, Cep Tlf | : | |
| Elektronik Posta Adresi | : | |
| Eğitim Durumu | : | |
| Mesleği, Ekonomik durumu | : | |
| Medeni Hali, Çocuk Sayısı | : | |

T.C. İSTANBUL VALİLİĞİ Beşiktaş İlçe Emniyet Müdürlüğü
ASLI GİBİDİR
..../..../20....

Müracaatta bulunan mağdur / şikâyetçiye delillerin toplanmasını isteme, soruşturmanın gizlilik ve amacını bozmamak koşuluyla Cumhuriyet Savcısından belge örneği isteme, vekili yok ise bir vekil yardımından yararlanmak istediği takdirde kendisine baro tarafından bir avukat görevlendirilmesini isteme, CMK' un 153' üncü maddesine uygun olmak koşuluyla vekili aracılığı ile soruşturma belgelerini, el konulan ve muhafaza altına alınan eşyayı inceletme, Cumhuriyet Savcısının kovuşturmaya yer olmadığı yönünde kararına kanunda yazılı usule göre itiraz etme haklarının bulunduğu kendisine hatırlatılıp, açıklandı;

Ceza Muhakemesi Kanununun 234'üncü maddesinde yazılı hususların yerine getirilmesinden sonra işbu ifade alma tutanağı okunup, müşteki ile diğer hazır bulunanlar tarafından imza altına alınmıştır. 06.03.2007 günü saat

| İFADEYİ ALAN | İFADEYİ YAZAN | İFADEYİ VEREN | AVUKAT |
|---|---|---|---|
| | | | Talep Etmedi |
| Polis Memuru | Polis Memuru | Müşteki | |

# JI BO EZ MAFÊN XWE HÎN BIBIM EZ DIKARIM SERÎ LI KU DERÊ BIDIM?

**1) YEKEYÊN KU BI SER WEZÎRIYA POLÎTÎKAYÊN MALBAT Û CIVAKÎ VE NE**

Em dikarin serî li gerînendetiyên bajar û bajarokan bidin û der barê Navenda Civakê, Navenda Şêwirîna Malbatî û Stargehê de, yên ku herî nêzikî me ne, agahiyan hildin.

Gerînendetiya Giştî ya Xizmetên Malbat û Civakê, Enqere (0312) 705 55 00

**XETA TUNDIYÊ YA ALO 183**
Xeta Şêwirîna Xizmetê ya Malbat, Jin, Zarok û Nivîşkanan

**2) NAVENDÊN BERGIRIYA LI TUNDIYÊ Û ŞOPÎNÊ (ŞÖNİM)**

**BAJARÊN PÎLOT ÊN KU LÊ ŞÖNİM HENE**

### ADANA
**Telefon:** (0322) 247 08 35
**Adres:** Huzurevleri Mah. 77139. Sok. No: 4 Çukurova, Adana

### ANKARA
**Telefon:** (0312) 348 36 86
**Adres:** Ulubey Mah. 863. Sok. No: 2 Altındağ, Ankara

### ANTALYA
**Telefon:** (0242) 227 20 62
**Adres:** Kültür Mah. 3844. Sok. No: 8 Kepez, Antalya

### BURSA
**Telefon:** (0224) 223 03 68
**Adres:** Karaağaç Mah. Eşrefler Cad. No: 25 Yıldırım, Bursa

### DENİZLİ
**Telefon:** (0258) 266 41 66
**Adres:** Kervansaray Mah. Barbaros Cad. No: 145 Bağbaşı/ Denizli

### DİYARBAKIR
**Adres:** Peyas Mah. Diclekent Dubleksleri 252. Sk. No: 37 ve 39 Kayapınar, Diyarbakır
**Telefon:** (0412) 257 21 50

### GAZİANTEP
**Adres:** Düğmeci Mah. Türkocağı Sok. No: 5/B Gaziantep
**Telefon:** (0342) 220 71 10

### İSTANBUL
**Telefon:**0212 465 21 96/97
**Adres:** Yeşilköy Mah. Halkalı Cad. No: 30 Bakırköy, İstanbul

### İZMİR
**Telefon:** (0232) 363 33 41
**Adres:**1847/15 Sok. No: 12 A Blok Bayraklı, İzmir

### MALATYA
**Telefon:** (0422) 212 32 25-26 – (0422) 212 32 20 (Alo 183'e bağlı)
**Adres:** Özalper Mahallesi Turgut Özal Bulvarı 1. Cadde No: 15 Malatya

### MERSİN
**Telefon:** (0324) 328 66 35
**Adres:** Gazi Mah.1323.Sok. No: 5 Yenişehir, Mersin

### SAMSUN
**Telefon:** (0362) 431 11 97
**Adres:** Ulugazi Mah. Şifayurdu Sok No:10 İlkyardım, Samsun

### ŞANLIURFA
**Telefon:** (0414) 313 56 31
**Adres:** Paşa Bağı Mahallesi 765. Sok. No: 42/B Merkez, Şanlıurfa

### TRABZON
**Telefon:** (0462) 231 40 12
**Adres:** Soğuksu Mah. Adli Soğuksu Cad. Huzur Sok. No: 10 Çamlık, Trabzon

**3) SERWÎSÊN ALÎKARIYÊ YÊN BAROYÊ YÊN EDLÎ**

Li gelek bajaran, di binyata baroyê de yekîneyên der barê Mafên Jinan de hene. Li bajarê ku em lê ne, em dikarin serî li Baroyê bidin da ku em xwe bigihînin yekîneyên têkildar û daxwaza alîkariya hiqûqî bikin.

**4) XETÊN DIN ÊN ŞÊWIRÎNA TUNDIYÊ**

- ALO 155 Hawar Polîs
- ALO 156 Hawar Cendirme
- ALO 112 Xeta Alîkariya Lezgîn a Bijîşkî
- ALO 157 Xeta Alîkariya Lezgîna a Mexdûrên Bazirganiya Mirovan û ya Îxbarê
- KAMPANYAYA TUNDIYA NAV MALBATÊ YA HURIYETÊ - XETA ALÎKARIYA LEZGÎN
  (0212) 656 96 96
- ALO XETA TUNDIYA LI JINAN A ŞAREDARIYA KADIKOYÊ
  (0216) 349 9 349

**5) STARGEHÊN JINAN ÊN SERBIXWE YAN JÎ YÊN BI SER ŞAREDARIYAN VE**

**ADANA KADIN DANIŞMA MERKEZİ VE SIĞINMA EVİ DERNEĞİ (AKDAM)**
(0322) 453 53 50- www.akdam.org.tr
E-posta: akdam_adana@mynet.com

**İZMİR BÜYÜKŞEHIR BELEDİYESI KADIN SIĞINAĞI**
(0232) 293 42 93

**İZMİR ALİAĞA BELEDİYESI KADIN SIĞINAĞI**
(0232) 616 19 80 / Dahili No: 191

**İZMİR BAYRAKLI BELEDİYESI KADIN SIĞINAĞI**
(0232) 367 73 88

**İZMİR BORNOVA BELEDİYESİ KADIN SIĞINAĞI**
(0232) 461 47 94

**İZMİR BUCA BELEDİYESI KADIN SIĞINAĞI**
(0232) 440 77 12

**İZMİR KARŞIYAKA BELEDİYESI KADIN SIĞINAĞI**
(0232) 330 58 18, (0232) 364 53 10, (0232) 368 88 03

**İZMİR ÖDEMİŞ BELEDİYESI KADIN SIĞINAĞI**
(0232) 544 36 33

**DİYARBAKIR BÜYÜKŞEHİR BELEDİYESI KADIN SIĞINAĞI**
(0412) 226 21 22 / 147 dahili - (0412) 229 48 80
(0533) 357 63 34, E-posta: dikasum@hotmail.com

**İSTANBUL KADIKÖY BELEDİYESİ KADIN SIĞINAĞI**
(0216) 542 52 00

**İSTANBUL KÜÇÜKÇEKMECE BELEDİYESİ KADIN SIĞINAĞI**
(0212) 411 07 77 / Beyaz Masa

**MOR ÇATI KADIN SIĞINAĞI VAKFI**
(0212) 292 52 31-32
www.morcati.org.tr / E-posta: morcati@morcati.org.tr

**6) NAVENDÊN ŞÊWIRÎN Û PIŞTGIRIYA LI JINAN ÊN SERBIXWE YAN JÎ YÊN BI SER ŞAREDARIYAN VE**

## ADANA
**ADANA KADIN DANIŞMA MERKEZİ VE SIĞINMA EVİ DERNEĞİ (AKDAM)**
(0322) 453 53 50 - www.akdam.org.tr
E-posta: akdam_adana@mynet.com

## ADIYAMAN
**YAŞAM DERNEĞİ**
(0505) 230 96 56

## AĞRI
**DOĞUBEYAZIT BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0472) 312 53 27, E-posta: ozlemmmarc@hotmail.com

## ANKARA
**ANKARA BAROSU ALO GELİNCİK HATTI**
(0312) 444 43 06

**ANKARA KADIN DAYANIŞMA VAKFI**
(0312) 430 40 05 - (0312) 432 07 82,
www.kadindayanismavakfi.org.tr
E-posta: kadindv@yahoo.com.tr

## ANTALYA
**ANTALYA KADIN DANIŞMA VE DAYANIŞMA MERKEZİ**
(0242) 248 07 66, www.antalyakadindanismadernegi.org,
E-posta: antalyakadinmerkezi@gmail.com

**ANTALYA KENT KONSEYİ KADIN MECLİSİ**
(0242) 243 69 92, E-posta: info@antalyakentkonseyi.org.tr

## BATMAN
**SELİS KADIN MERKEZİ**
(0488) 221 07 26 – (0543) 834 32 99

## BİTLİS
**TATVAN BELEDİYESİ MİZGİN KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0434) 827 99 30

## BURSA
**NİLÜFER BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0224) 452 82 13-14

## ÇANAKKALE
**ÇANAKKALE KADIN DANIŞMA MERKEZİ (ELDER)**
(0286) 217 06 03

## ÇANKIRI
**ÇANKIRI KADIN DANIŞMA VE DAYANIŞMA DERNEĞİ,**
E-posta: iletisim@kadindayanisma.org

## DİYARBAKIR
**DİYARBAKIR BÜYÜKŞEHİR BELEDİYESİ KADIN SORUNLARI ARAŞTIRMA VE UYGULAMA MERKEZİ (DİKASUM)**
(0412) 226 21 22 / 147 dahili - (0412) 229 48 80
(0533) 357 63 34, E-posta: dikasum@hotmail.com

**BAĞLAR BELEDİYESİ KARDELEN KADIN EVİ**
(0412) 234 26 47, E-posta: kardelenkadinevi@hotmail.com

**BAĞLAR KADIN KOOPERATİFİ**
(0412) 234 26 47, E-posta: baglarkooperatifi@hotmail.com

**BİSMİL NUJEN KADIN MERKEZİ**
(0543) 380 66 91 – (0535) 012 72 53, E-posta: nukev@mynet.com

**CEREN KADIN DERNEĞİ**
(0412) 251 58 27, E-posta: cerenkadin@hotmail.com

**ÇINAR BELEDİYESİ JİNWAR KADIN DANIŞMANLIK MERKEZİ**
(0412) 511 20 11 - (0533) 698 67 73,
E-posta: jinwarkadin@hotmail.com

**ERGANİ SELİS KADIN MERKEZİ**
(0412) 611 30 07, E-posta: erganiselis@hotmail.com

**KADIN MERKEZİ (KAMER)**
(0412) 228 10 53, www.kamer.org.tr
E-posta: d.kamer@superonline.com

**KARDELEN KADIN EVİ – BAĞLAR**
(0412) 234 20 41 – 0530 695 14 87 – 0530 695 14 86,
E-posta: kardelenkadınevi@mynet.com

**KAYAPINAR EKİN CEREN KADIN MERKEZİ**
(0412) 251 10 81, E-posta: cerendanismanlik@hotmail.com

**LİCE NUJİVAN KADIN MERKEZİ**
(0543) 318 59 21

**SELİS KADIN DANIŞMANLIK MERKEZİ**
(0412) 224 77 28, E-posta: seliskadin@yahoo.com

**SİLVAN MEYA KADIN MERKEZİ**
(0507) 479 63 51, E-posta: meya_kadin@hotmail.com

**SUR KADEM**
(0535) 544 05 35, E-posta: surkadem@hotmail.com

**YENİŞEHİR BELEDİYESİ EPİDEM KADIN DANIŞMANLIK MERKEZİ**
(0412) 226 60 02, E-posta: epidem@mynet.com

## HAKKARİ

**HAKKARİ BELEDİYESİ BİNEVŞ KADIN MERKEZİ**
(0541) 730 83 48

## İSTANBUL

**BAŞAK KÜLTÜR ve SANAT VAKFI**
(0216) 420 49 68, E-posta: basaksanat@gmail.com

**GÖKKUŞAĞI KADIN DERNEĞİ**
(0212) 244 83 00, E-posta: gokkusagikadin@hotmail.com

**İSTANBUL KADIKÖY BELEDİYESİ KADIN SIĞINAĞI**
(0216) 542 52 00

**İSTANBUL KÜÇÜKÇEKMECE BELEDİYESİ KADIN SIĞINAĞI**
(0212) 411 07 77 / Beyaz Masa

**KADININ İNSAN HAKLARI - YENİ ÇÖZÜMLER DERNEĞİ**
(0212) 251 00 29, www.kadinininsanhaklari.org
E-posta: newways@wwhr.org

**KADINLARA HUKUKİ DESTEK MERKEZİ DERNEĞİ (KAH-DEM) - İSTANBUL**
www.kahdem.org.tr / E-posta: kahdem@gmail.com

**MOR ÇATI KADIN SIĞINAĞI VAKFI**
(0212) 292 52 31-32, www.morcati.org.tr
E-posta: morcati@morcati.org.tr

## İZMİR

**İZMİR KADIN DAYANIŞMA DERNEĞİ**
(0232) 482 10 77

**İZMİR BÜYÜKŞEHIR BELEDİYESI KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 293 42 93

**İZMİR ALİAĞA BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 616 19 80 / Dahili No: 191

**İZMİR BAYRAKLI BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 367 73 88

**İZMİR BERGAMA BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 632 80 05/ DAHILI NO: 164

**İZMİR BORNOVA BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 461 47 94

**İZMİR BUCA BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 440 77 12

**İZMİR ÇİĞLİ BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 329 07 34

**İZMİR DİKİLİ BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0533) 739 82 37

**İZMİR GAZİEMİR BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 252 56 57

**İZMİR KARŞIYAKA BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 330 58 18, (0232) 364 53 10, (0232) 368 88 03

**İZMİR KONAK BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 425 35 01

**İZMİR KEMALPAŞA BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 878 12 22

**İZMİR NARLIDERE BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 239 73 00

**İZMİR ÖDEMİŞ BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 544 36 33

**İZMİR SEFERİHİSAR BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 743 58 17

**İZMİR SELÇUK BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 892 7326

**İZMİR URLA BELEDİYESİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0232) 754 12 68

## KIRIKKALE

**KADIN DAYANIŞMA VE DESTEKLEME DERNEĞİ**
E-posta: kddd_tr@hotmail.com

**KIRIKKALE KADIN PLATFORMU DERNEĞİ**
E-posta: kap-der@hotmail.com

## MARDİN

**DERİK PELJİN KADIN MERKEZİ**
(0506) 921 96 59, E-posta: peljin_kadinevi@hotmail.com

**NUSAYBİN BELEDİYESİ GÜLŞİLAV KADIN EVİ**
(0482) 415 73 21, E-posta: gulsilavkadinevi@hotmail.com

## MERSİN

**AKDENİZ BELEDİYESİ İŞTAR KADIN DANIŞMANLIK MERKEZİ**
(0324) 232 04 42 – (0543) 201 17 17,
E-posta: mersinistar@hotmail.com

**MERSİN BAĞIMSIZ KADIN DERNEĞİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0324) 337 20 21, E-posta: bkdmersin@yahoo.com

## MUŞ

**MUŞ KADINLARLA DAYANIŞMA DERNEĞİ**
E-posta: kadinndayanismasi@gmail.com

**MUŞ KADIN DERNEĞİ (MUKADDER)**
(0436) 212 56 66, E-posta: mukaddermus@hotmail.com

## NEVŞEHİR

**KAPADOKYA KADIN DAYANIŞMA DERNEĞİ**
(0384) 212 34 51, E-posta: kapadokyakadin@hotmail.com

## SİİRT

**SİİRT BELEDİYESİ BERFİN KADIN MERKEZİ**
(0484) 222 23 52, kadinberfin@hotmail.com

## ŞIRNAK

**CİZRE BELEDİYESİ SİTTİYA ZİN KADIN DANIŞMANLIK MERKEZİ**
(0486) 616 14 67, E-posta: zinusitikadin@hotmail.com

**SİLOPİ BELEDİYESİ VİYAN KADIN DANIŞMANLIK MERKEZİ**
(0486) 518 50 51

**ZİLAN KADIN DANIŞMANLIK DERNEĞİ**
(0486) 216 10 30 - (0541) 600 11 65,
E-posta: zilander@hotmail.com

## TUNCELİ

**TUNCELİ BELEDİYESİ DERSİM YAŞAM KADIN DANIŞMANLIK MERKEZİ**
(0428) 212 12 93 – (0531) 601 44 86,
E-posta: dersimyasam@hotmail.com

## URFA

**URFA YAŞAM EVİ KADIN DAYANIŞMA DERNEĞİ**
(0414) 315 17 25 – (0505) 561 71 36,
E-posta: yasam_evi@hotmail.com

**VİRANŞEHİR BELEDİYESİ BERJİN AMARA KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0554) 756 54 86 - (0414) 511 46 80,
E-posta: berjin.amara@gmail.com

## VAN

**ERCİŞ KADINLARI KORUMA VE DAYANIŞMA DERNEĞİ**
(0543) 736 27 73

**VAN KADIN DERNEĞİ KADIN DANIŞMA MERKEZİ (VAKAD)**
(0432) 214 45 87, www.vakad.org.tr
E-posta: kadindernegi@gmail.com

**VAN BELEDİYESİ KADIN SORUNLARI ARAŞTIRMA VE UYGULAMA MERKEZİ (VAKASUM)**
(0432) 216 57 93 - (0543) 878 35 02 – (0543) 421 21 32,
E-posta: vakasum.kdm@gmail.com

**VAN BOSTANİÇİ KADIN KOOPERATİFİ - MAYA KADIN DANIŞMA MERKEZİ**
(0432) 213 29 85 – (0543) 675 92 27,
E-posta: mayakadin@hotmail.com

## KUZEY KIBRIS

E-posta: info@feministatolye.org

**SOSYAL RİSKLERİ ÖNLEME VAKFI**
(0392) 228 99 55

### 7) LÎSTEYA HIN SAZIYÊN DIN ÊN KU DESTEKÊ DIDIN JINAN

**KADIN EMEĞİNİ DEĞERLENDİRME VAKFI (KEDV)**
(0212) 249 0700, www.kedv.org.tr, E-posta: kedv@kedv.org.tr

**TÜRKİYE KADIN GİRİŞİMCİLER DERNEĞİ (KAGİDER)**
(0212) 227 41 44, www.kagider.org,
E-posta: kagider@kagider.org

**ANNE ÇOCUK EĞİTİM VAKFI (AÇEV)**
(0212) 213 42 20, www.acev.org, E-posta: acev@acev.org

**KADIN ADAYLARI DESTEKLEME VE EĞİTME DERNEĞİ (KA-DER)**
(0212) 273 2535, www.ka-der.org.tr,
E-posta: kadergm@e-kolay.net

**FİLMMOR KADIN KOOPERATİFİ**
(0212) 251 59 94, www.filmmor.org

**UÇAN SÜPÜRGE KADIN İLETİŞİM VE ARAŞTIRMA DERNEĞİ**
(0312) 427 00 20, www.ucansupurge.org
E-posta: info@ucansupurge.org

**KADIN ESERLERİ KÜTÜPHANESİ VE BİLGİ MERKEZİ VAKFI**
(0212) 534 95 50, www.kadineserleri.org

**TÜRK TABİPLER BİRLİĞİ KADIN KOMİSYONLARI**
(0312) 231 31 79, www.ttb.org.tr

# FERHENGOK

**aborî**: ekonomi
**acizker**: bıktırıcı, rahatsızlık verici
**agahî**: bilgi
**aloz**: karmaşık, kompleks
**ango**: yani
**araste**: yön, yönelim
**araste kirin**: yönlendirmek
**armanc**: amaç, hedef
**asayî**: olağan, normal
**asteng**: engel
**avekî**: sıvı
**axivîn**: konuşmak
**bajar**: il
**bajarok**: ilçe
**baldar**: dikkatli
**baldarî**: dikkat
**belge**: belge
**belgedar**: belgeli
**belgedar kirin**: belgelemek
**berasteng kirin**: engellemek
**berdan**: boşama
**berêtî**: öncelik
**bergind**: karşılık
**bergir**: önleyici
**bergirî**: önlem
**bergirî lê kirin**: önlemek
**berhemhênan**: yapım
**berjewendî**: çıkar, menfaat
**ber lê girtin**: önlemek
**bername**: program
**berpirs**: sorumlu
**berpirsî**: sorumluluk
**bersiv**: cevap
**bersûc**: sanık
**bertek**: tepki
**beş**: bölüm
**beşdarî**: katılım
**bexşandin**: bağışlamak, affetmek
**bêrîtiya zayendî**: cinsel dokunulmazlık
**bibir**: kesici
**bişkoj**: düğme
**bijûndar**: sağlıklı
**bijûndarî**: sağlık
**bi kar anîn**: kullanmak
**binkeya bijûndariyê**: sağlık ocağı
**binpê kirin**: ihlal etmek
**biqilqal**: endişeli
**biryar**: karar
**biryar dan**: karar vermek
**biserûber**: düzenli
**bizavkar**: eylemci, aktivist
**bîrewer**: anlayışlı, bilinçli
**bûyer**: olay
**cihkî**: yerel
**civak**: toplum
**civakî**: sosyal, toplumsal
**cudakar**: ayrımcı
**cudakarî**: ayrımcılık
**cure**: tür
**çalak**: etkin, faal, aktif
**çalakî**: etkinlik, faaliyet
**çand**: kültür
**çandî**: kültürel
**çavkanî**: kaynak
**çekên agirbar**: ateşli silah
**çewisandin**: baskı yapmak, ezmek
**dabaş**: konu, bahis, söz konusu
**dabîn kirin**: sağlamak, temin etmek
**dab û nêrît**: gelenek görenek
**dadgeh**: mahkeme, adliye
**dahat**: gelir
**damezirandin**: kurmak
**darizandin**: yargılamak
**demkî**: geçici
**derbirin**: ifade etmek, dışa vurmak
**derfet**: olanak, imkan
**destpêk**: başlangıç, giriş
**destûr**: izin
**dibistan**: okul
**diyarî**: hediye
**dîdarî**: görüşme
**dîmen**: görüntü
**domdirêj**: uzun süreli
**doz**: dava
**dozger**: savcı
**dozgerî**: savcılık
**ducanî**: hamile, gebe
**ducanîtî**: hamilelik, gebelilik
**duçar bûn**: maruz kalmak
**encam**: sonuç
**endam**: üye
**erênî**: olumlu
**erk**: görev
**erkdar**: görevli
**ewledar**: güvenli
**ezmûn**: sınav, imtihan
**êrîşkar**: saldırgan
**fêrgeh**: derslik
**gelemper**: kamu
**gelemperî**: kamusal
**gerdenî**: kolye
**gêran**: yetişkin
**gilî**: şikayet

**gilîkar**: şikayetçi
**gerînende**: müdür
**gerînendetî**: müdürlük, müdüriyet
**girîng**: önemli
**girte**: tutanak
**girtename**: tutanak metni
**guhêzbar**: Taşınır, menkul
**guherdetî**: değişiklik
**guncandin**: uyarlamak, uygun hale getirmek
**gundewar**: kırsal
**handan**: teşvik etmek
**helwest**: tavır
**heman**: aynı
**hevzayend**: eşcinsel
**hevzayendî**: eşcinsellik
**hest**: duygu
**hestî**: duygusal
**hevberdan**: boşanma
**hevdîtin**: görüşme
**hevkarî**: 1. işbirliği 2. ortaklık
**hevok**: cümle
**hevser**: eş (karı ve kocalardan her biri)
**hewcedar**: muhtaç, gerekli
**hewîn**: barınmak
**hewl**: çaba, gayret
**hewldan**: çabalamak
**hêmin kirin**: sakinleştirmek, yatıştırmak
**hêsan**: basit, kolay
**hêvişandin**: korumak
**hêvişîn**: korunma
**hêvişkar**: koruyucu
**hêvişîner**: koruyucu
**hêvişînerî**: koruyuculuk
**hincirandin**: hırpalamak
**isrardar**: ısrarlı
**jêhatî**: becerikli, çalışkan
**ji ber xwe kirin**: çocuk aldırmak
**jîngeh**: çevre
**kardar**: işveren
**karmend**: memur
**kartêker**: etkin
**kevneşopî**: gelenek
**keya**: muhtar
**kirdarî**: uygulama, pratik
**kiryarî**: eylem, edim, fiil
**kitêbok**: kitapçık
**komar**: cumhuriyet
**komele**: dernek
**kumreşî**: (eşler arasındaki) kıskançlık
**lêborîn**: affetme, özür, özür dileme
**lênêr**: bakıcı
**lênêrî**: bakıcılık
**lêpirsîn**: soruşturma
**lê werqilîn**: fark etmek, farkına varmak
**lêzim**: akraba
**madeyên kêfder**: uyuşturucu madde
**maf**: hak
**makeqanûn**: Anayasa
**malbat**: aile
**mawe**: süre
**mebest**: amaç, gaye
**merc**: şart, koşul
**meriyet**: yürürlük
**mêwe**: meyve
**mêwefiroş**: manav
**mijar**: konu
**misoger**: 1. kesin, kat'î 2. garanti
**mize**: ücret
**mizedar**: ücretli
**mînak**: örnek
**nasname**: kimlik
**navend**: merkez
**navgîn**: araç
**navneteweyî**: uluslararası
**navnîşan**: adres
**neguhêzbar**: taşınmaz, gayri menkul
**nemaze**: özellikle
**netewe**: ulus, millet
**netewetî**: milliyet
**Neteweyên Yekbûyî**: Birleşmiş Milletler
**neteweyî**: ulusal
**nimûne**: örnek
**nivîskî**: yazılı
**nîjad**: ırk
**nîqaş**: tartışma
**nûner**: temsilci
**nûnerî**: temsilcilik
**ol**: din
**parêzer**: avukat
**parêzî**: savunma
**parêzkar**: koruma, koruyucu
**paşnav**: soyadı
**paxav pê kirin**: umursamak
**pederşahî**: ataerkil- erkek egemen sistem
**pejirandin**: kabul etmek
**perwerde**: eğitim
**perwerdekar**: eğitimci, eğitici
**pesen**: onay
**pesend kirin**: onaylamak
**pest**: baskı
**peyivîn**: konuşmak
**peywir**: görev
**peywirdar**: görevli
**pêşmerc**: ön koşul
**peyman**: sözleşme
**pêk anîn**: gerçekleştirmek, temin etmek
**pêkutî**: baskı

**pêşdarazî**: önyargı
**pêşdibistan**: anaokulu
**pêşniyaz**: teklif
**pêşniyaz kirin**: teklif etmek
**pêşnûma**: tasarı
**pêvajo**: süreç
**pêwîst**: gerek, gerekli, lazım
**pêwîstî**: gereklilik, ihtiyaç
**pispor**: uzman
**pisporî**: uzmanlık
**pixudî**: içe kapanık
**pîşe**: meslek
**polîsxane**: polis merkezi, polis karakolu
**pûte pê dan**: özen göstermek
**qad**: alan
**Qanûna Bingehîn**: Anayasa
**qedexe**: yasak
**qedexe kirin**: yasaklamak
**qefaltin**: yakalamak, tutmak (zapetmek)
**qeyran**: kriz
**qilqilîn**: endişelenmek, tedirginleşmek
**qulker**: delici
**qusek**: çürük, morartı
**rajêr**: alt, ast
**raman**: düşünce
**rapirsî**: referandum, halkoylaması
**raser**: üst
**raserî**: üstünlük
**raye**: yetki
**rayedar**: yetkili
**raz**: sır
**reftar**: davranış
**rêbaz**: yol yordam, yöntem
**rêje**: oran
**rêlibergirtin**: önlem, önleme
**rêxistin**: örgüt
**rûmetşikên**: onur kırıcı
**rûniştgeh**: konut, ikametgah
**rojane**: günlük
**sazî**: kurum, kuruluş
**sepan**: uygulama
**sepandin**: ugulamak
**serbixwe**: bağımsız
**serdan**: görüş, ziyaret
**serlêdan**: başvuru, müracaat
**sermedî**: müebbet
**sînorker**: sınırlayıcı
**stargeh**: sığınak
**suxre**: angarya
**sûd**: fayda, yarar
**sûdwer**: faydalı, yararlı
**sûdwer bûn**: faydalanmak, yararlanmak
**sûd wergirtin**: faydalanmak, yararlanmak
**şano**: tiyatro
**şaredarî**: belediye
**şarezatî**: beceriklik, yeteneklilik
**şêl**: hal hareket, davranış
**şêwe**: şekil, biçim, tarz
**şêwirmend**: danışman
**şêwirmendî**: danışma
**şîrove**: yorum
**şîrove kirin**: yorumlamak
**şopandin**: izlemek, takip etmek
**şû**: koca
**taybet**: özel
**taybetî**: özellik
**tacîzkar**: tacizci
**tecawizkar**: tecavüzcü
**tendurist**: sağlıklı
**tenduristî**: sağlık
**temen**: ömür, yaş
**tesîrdar**: etkili
**tesîrdar bûn**: etkilenmek
**teqez**: mutlaka
**tevger**: hareket, davranış
**tevkarî**: katkı
**texilandin**: caydırmak
**têgih**: kavram
**têkoşîn**: mücadele
**tê koşîn**: mücadele etmek
**tundî**: şiddet
**vegotin**: anlatmak
**veguhastina komelî**: toplu taşıma
**veser**: ek, ilave
**vexwendin**: çağırmak, davet etmek
**wate**: anlam, mana
**welatî**: yurttaş, vatandaş
**wekhev**: eşit
**xal**: 1. ben, nokta 2. madde
**xapxapok**: dolandırıcı
**xapxapokî**: dolandırıcılık
**xetere**: tehlike
**xewherimîtî**: uyku bozukluğu
**xirandin**: ayartmak, yanıltmak
**xizan**: fakir, yoksul
**xizanî**: fakirlik, yoksulluk
**xwegirtîbûn**: içe kapanma
**yeke**: birim
**yeksan**: eşit
**yeksanî**: eşitlik
**zanîngeh**: üniversite
**zanist**: bilim
**zanistî**: bilimsel
**zarokxane**: kreş
**zayek**: doğurgan
**zayekî**: doğurganlık
**zayend**: cinsiyet
**zayendî**: cinsel, cinsi
**zayendîtî**: cinsellik
**zendane**: bileklik

# MAFÊN ME HENE!

**Komeleya Mafên Mirovan ên Jinan - Çareseriyên Nû**, bi mebesta ku li Tirkiyeyê û li dinyayê mafên mirovan ên jinan biparêze û wan pêk bîne, di sala 1993'yan de hatiye avakirin ku ew saziyeke civaka sivîl û serbixwe ye. Navê wê jî, ji gotina "mafên jinan mafên mirovan in" tê ku di encama Konferansa Mafên Mirovan a Dinyayê de derketibû holê û ew konferans ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve di heman salê de li Viyanayê hatibû lidarxistin. Komele, bi mebesta ku mafên mirovan ên jinan bi awayekî tam bên sepandin û jin bi awayê ferdên azad û welatiyên wekhev beşdarî her warê jiyanê bibin, di asta cihkî, neteweyî û navneteweyî de dixebite.

Komeleya Mafên Mirovan ên Jinan - Çareseriyên Nû, bi xebatên xwe yên bênavber ên der barê warên bipêşxistina hişmendiya mafan de ya ji bo jinan, parêzkarî, pêkanîna torên piştgiriyê û berbelavkirina zanyariya femînîst, di asta neteweyî û navneteweyî de bûye rêxistineke civaka sivîl a rêzdar û naskirî. Komeleya Mafên Mirovan ên Jinan - Çareseriyên Nû, di encama van xebatan de, li Tirkiyeyê alîkariyeke girîng li berbelavbûna perwerdehiya mafên mirovan a jinan û li pêkhatina reformên qanûnî kiriye, di nav civakên misliman de jî toreke berfireh çêkiriye û li Neteweyên Yekbûyî jî bûye yek ji parêzkarên pêşeng ên mafên mirovan ên jinan. Komeleya Mafên Mirovan ên Jinan - Çareseriyên Nû, ji ber alîkirina li bipêşxistina wekheviya zayenda civakî û edaleta civakî, di sala 1999'an de ji aliyê Komeleya Di Pêşketinê De Mafên Jinan (AWID) ve layiqî ***Xelata Çareseriyên Nû*** hate dîtin û di sala 2005'an de jî li Konseya Aborî û Civakî ya Neteweyên Yekbûyî bûye xwedî Statuya Şêwirê ya Taybet. Her wiha Komeleya Mafên Mirovan ên Jinan - Çareseriyên Nû di sala 2007'an de, ji ber lidarxistina kampanyayên ji bo reformên qanûnî û bi çêkirina torên piştgiriyê yên di bin navên **Koalîsyona Mafên Zayendî û Bedenî ya Li Civakên Misliman (CSBR)** de ku ew li nav civakên misliman ji bo pêkanîna mafên jinan ên zayendî, bedenî û zayekiyê hatine çêkirin û ji ber xebatên parêzkariyê ve **Xelata Mafên Jinan a Navneteweyî** ya Weqfa Gruberê qazanc kiriye.

**Bernameya Perwerdehiyê ya Mafên Mirovan a Jinan** ku komeleyê ew bi pêş ve biriye û li Tirkiyeyê ji sala 1995'an ve gihîştiye zêdetirî 12 hezar jinî, hîn jî li Tirkiyeyê û dinyayê yek ji bernameyên perwerdehiyê ya mafên mirovan a dombar, berfireh û berbelav e. Di sala 2004'an de Bernameya Perwerdehiyê ya Mafên Mirovan a Jinan di çarçoveya *Projeya Taktîkên Nû ya Navneteweyî* de wek "**yek ji taktîkên herî baş ên ku li dinyayê di warê mafên mirovan de tê bikaranîn**" hatiye hilbijartin.

Bernameya Perwerdehiyê ya Mafên Mirovan a Jinan ku di navbera salên 1998 - 2011'an de, bi Saziya Hêvişandina Zarokan û Xizmetên Civakî re, bi awayekî hevkarî dihat sepandin, di 2011'an de piştî fesxkirina saziya navborî, bi tevkariya ji 100'î zêdetir perwerdekarên Bernameya Perwerdehiyê ya Mafên Mirovan a Jinan'ê yên çalak ve ku ew bi Wezîriya Malbat û Polîtîkayên Civakî re dixebitin, tê meşandin. Ji sala 2002'yan bi vir de, şaredarî û rêxistinên jinan ên serbixwe jî beşdarî vê hevkariyê bûne. 54 jinên bizavkar ên ku di van saziyan de dixebitin, li 20 bajar û Qibrisê sepanên qadî yên Bernameya Perwerdehiyê ya Mafên Mirovan a Jinan'ê didin meşandin.

- Armanca Bernameya Perwerdehiyê ya Mafên Mirovan a Jinan'ê ew e ku jinan der barê mafên wan de bîrewer û hişyar bike, bike da ku ew wan mafan bi kar bînin û ji bo wan xebatên hewcedar ên zanîn û şarezatiyê pêk bîne.
- Bername, ji çêbûna rêxistinbûna cihkî re dibe destek û bi rêxistinên cihkî yên jinan û saziyên cihkî re di nav şirîkatiyê de tê sepandin.
- Ji sala 1998'an bi vir de, li **54 bajarên** Tirkiyeyê û li Qibrisê, tevîhev bi navgîna **680 Xebata Komî ya** Bernameya Perwerdehiyê ya Mafên Mirovan a Jinan'ê gihîştiye zêdetirî **12 hezar** jinî.
- Rêzeya kitêboka bi navê **Mafên Me Hene!** ku mafên jinan ên qanûnî, zayendî û zayekiyê li xwe digire, gihîştiye ber destê zêdetirî **26.000** jinî.
- Komele, bi navgîna Bernameya Perwerdehiyê ya Mafên Mirovan a Jinan'ê bi 13 rêxistinên jinan re yên ku li qadên cihkî dixebitin, şirîkatiya saziyî pêk aniye.
- Her wiha, li gorî encamên lêkolînên serbixwe yên ku di navbera salên 2005 û 2011'î de dane ber xwe, jinên ku beşdarî Bernameya Perwerdehiyê ya Mafên Mirovan a Jinan'ê bûne;
- Hatiye dîtin ku wan kariye bi rêjeya **%60 tundiya fizîkî, %33 tundiya hîsî** û **%27** jî **tundiya aborî** bidine sekinandin.
- %35'ê wan ji bo ku perwerdehiya xwe bibine serî, li dibistana xwe vegeriyane.
- %33'yê wan bi berginda dahatê dest bi jiyana xebatê kiriye yan jî lê vegeriyane û %7'ê van jinan jî ji xwe re cihê kar vekiriye.
- %94'ê wan diyar kiriye ku xwebaweriya wan zêde bûye; %89'ê wan gotiye ku di standina biryarên nav malbatê de hîn zêdetir tesîra wan çêbûye; %69'ê wan daxuyandiye ku li derdora xwe ji aliyê siyasî ve hîn bêhtir çalak bûne û %59'ê wan jî aşkera kiriye ku ew bi awayekî çalak beşdarî rêxistineke jinan bûne.

**RÊZEYA MAFÊN ME HENE!**

**Mafên Me Hene!**
**Zayendîtiya Me Heye!**
**Mafên Me yên Zayekiyê Hene!**

**KOMELEYA MAFÊN MIROVAN ÊN JINAN - ÇARESERIYÊN NÛ**
Kadının İnsan Hakları - Yeni Çözümler Derneği
Women for Women's Human Rights (WWHR) - New Ways
İnönü Cad. Saadet Apt. No: 29/6 Gümüşsuyu 34437 Stenbol, Tirkiye
Tel: +90 (212) 251 00 29 - Faks: +90 (212) 251 00 65
E-posta: newways@wwhr.org / Web: www.kadininsanhaklari.org - www.wwhr.org
KadininInsanHaklariYeniCozumler / @kadinih

ISBN 978-605-86324-5-5